

# HELWEST

## KOVARA ÇAND Û EDEBÎYATA KURDÎ

- ✿ Helwesta Rexnegiriyê
- ✿ Rexneyên Edebî û Valahiya Rexnegiriyê — Lokman POLAT
- ✿ Huner û Pêvajoya Nû — N. ZAXÛRANÎ
- ✿ Muzîka Kurdî — Senar ŞAHÎN
- ✿ Rewşa Nivîskarêne Kurd — Cîhan DILŞAD
- ✿ Bexçeyê Evînê — Bawer DELÎL
- ✿ M. Emîn BOZARSLAN û Berhemên wî
- ✿ Post - Modernîzm — Burhan GUNEL
- ✿ Hîmdarê Edebîyata Kurdî Ehmedê Xanî — M. YILMAZ
- ✿ Ziman û Zimanê Kurdî — Sîpan — Medenî FERHO
- ✿ Nivîskarî û Berpirsiyarî — Z. ŞÊXMÜS
- ✿ Ji Bo Nameyên Xwendevanan
- ✿ Xelata Kurteçiroka Kurdî

HEJMAR / NO: 1

\*\*\*\*\*

SAL / YEAR : 1995



# HELWEST

## Kovara Çand û Edebîyata Kurdî

**Utgivare**  
Modern Kultur Förlaget

**Xwedî**  
Weşanên Çanda Nûjen

**Birêvebirê kovarê**  
Lokman POLAT

Hejmar : 1

Sal / Year : 1995

Abonetî  
Salek : 150 Kr.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

**Helwest** kovara çand û  
edebîyata Kurdî ye.  
Rûpelên wê ji hemû  
nivîskarêne Kurd re  
vekirîne. Berpirsiyariya  
her nivîsê, ya nivîskarê/a  
wê ye.

**Navnişan / Adress:**  
Tensta Alle 43 - 2tr.  
16364 Spånga /Sweden

## NAVEROK

- \* 5 - Helwesta Rexnegiriyyê
- \* 8 - Rexnên Edebî û Valahîya  
Rexnegiriyyê \* Lokman POLAT
- \* 11 - Huner û pêvajoya nû  
N. ZAXURANI
- \* 19 - Muzîka Kurdî  
Senar ŞAHÎN
- \* 21 - Rewşa Nivîskarêne Kurd  
Cîhan DILŞAD
- \* 24 - Bexçeyê Evînê  
B. DELİL
- \* 25 - Post - Modernîzm  
Burhan Gunel
- \* 29 - Keça Elewî
- \* 32 - M. E. Bozarslan
- \* 38 - Hîmdarê Edebîyata  
Kurdî Ehmedê Xanî
- \* 42 - Ziman û Zimanê Kurdî
- \* 44 - Sîpan - Medenî FERHO
- \* 47 - Nivîskarî û Berpirsiyarî

# JI BO NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Gelî xwendevanan!

Kovara **Helwest** bi hejmara xwe ya yekemîn ji we re rojbaş dibêje. Rûpelên kovara **Helwestê** ji nivîs û nameyên xwendevanan re vekiriye. Di van rûpelên kovara **Helwestê** de bi nameyên xwe dîtin û rexneyên xwe bînin ziman. hûn li ser kîjan babetî dixwazin, dikarin mineqeše bikin.

Kovara **Helwestê** bîr û bawerîya xwe bi azadîya fikirî, ramanî hanîye. Her mirov azad e ku ji bo her tiştî fikirê xwe bibêje, helwesta xwe eşkere bike. Çawan ku di pirsên sîyasî û civakî de her mirov xwedîyê helwestek e, di pirs û babetên çandî û edebî de jî divê helwestekî mirov hebe. Bi nameyên xwe, hûn dê kovarê dewlemend bikin.

Em li benda nameyên we ne. Di nameyên xwe de ji bo kovara **Helwestê** jî dîtinnêن xwe bibêjin, rexneyên xwe bikin. Bi dîtin û rexneyên we, bi pêşniyazên we, dê kovara **Helwest** baş bibe, bike-mile, têkûz bibe, xurt bibe.

Ji bo kovareke xweş û baş, ji bo kovarek ji alî na-veroka xwe ve dewlemend, ji bo mineqeše û rexneyên edebî, destêن xwe bavêjin pênûsê û ji kovara **Helwestê** re name binivîsînin û bişeynin.

Em li benda nameyên we ne.

**Kovara Helwest**

## HELWESTA REXNEGIRIYÊ

Xwendevanêن hêja!

Kovara çand û edebîyata Kurdî Helwest, dê li ser bing-eha mineqeqeyên çandî û edebî û rexnegiriya zanîstî û edebî weşana xwe bimeşîne. Di nav weşanêن Kurdî yên heyî de beşa herî qels tûnebûn an jî nekirina rexne û mineqeqeyên edebî ye. Di nav Kurdan de rexnegiriya edebî qet pêş neketiye. Li ser cure, cure babetên çandî û edebî mineqeqe nayê kirin. Di nav weşanêن Kurdî yên heyî de valahîya herî mezin tûnebûna mineqeqe û rexney-an e. Kovara helwest bi bawerîya ku piçek be jî, vê valahiyê tijî bike û di vê babetê de helwestek rexnegiriye bixe jîyanê, dest bi weşana xwe dike.

Kovarêن Kurdî yên heyî, hemû jî li gor xwe rolekî dileyizin. Kovara Helwest alternatîfa van kovarêن heyî nîne. Naveroka kovara Helwestê ji

van kovarêن heyî dê cîhê be. Pêwîstiya bi her awayî cure cure kovarêن Kurdî heye. Neteweyêن cîhanê, herkê bi zimanê xwe bi sedan kovar derdixin. Kovarêن xwerû Kurdî-Laťînî hemû li ser hev ji dehî nabûre. Di her babetî de kovarêن li gor şaxêن xwe yên taybetî hebe baş e. Çawan ku kovara "Şano û Sînema" kovara "Berhem" û kovara "Nûdem" li gor şaxêن xwe kovarêن taybetî ne, kovara Helwestê jî dê li gor xwe kovarek li ser hîmîn rexnegiriye û mineqeqe kovarek taybetî be.

Di nav nivîskar û rewşenbîrêن Kurdan de rexnegirî baş nehatiye fêmkirin. Pîvana rexneyên edebî divê li nav Kurdan bê rûniştandin. Li gor metoda rexnegiriya edebî divê li berhemîn edebî rexne bê kirin.

Kovara Helwest, dê rûpelên xwe jî mineqeqe û rexneyên

## Helwesta Rexnegiriyê

îlmî-zanîstî re vebike. Li gor metoda rexnegiriya zanîstî dê berhemên çandî û edebî binirxînê.

Kovara Helwest hejmara yekemîn dê ji bo tûnebûna mineqeşe û rexneyan gazi-nek be. Lê, hejmara duyemîn dê bi naverokekî xurt û hemû jî bi nivîsên rexne û mineqeşeyê bê dagirtin. Li ser her babetên cuda, li ser problemên edebîyatê û nivîskarîyê, dê gelek nivîsên mineqeşê bê weşandinê. Li benda hejmara duyemîn bin.

Kovara Helwest ji hemû nivîskarêne Kurd re vekirîye. Ew xwe pozbilind nabîne û qîmetê dide hemû nivîsan. Nivîsên ku ji kovara Helwestê re bê rîkirin, ew nivîs dê bêne weşandin. Kovara Helwest Ji bo naveroka nivîsan helwestek negatif nîşan nade û van nivîsan li gor pîvanê xwe li mîzînê naxe. Ji bo naveroka nivîsan bila xwendevan biryara xwe bidin. xwedîyênl eslî yên kovaran xwendevan bi xwe ne.

Kovara Helwest, ji bo ku bi

naveroka xwe dewlemend be, ji babetên cuda cuda, dê nivîs biweşîne. Dê beşen helwestên çandî û edebî, helwestên muzîkî, helwestên zimanî û helwestên dîrokî hebin. Di van beşan de, dê nivîsên cure bêne weşandin e. Di her hejmara kovara Helwestê de, dê beşa "Cihana Nivîskarêne Kurd" hebe. Di vê beşê de em dê li ser portre yên nivîskaran, li ser kar û xebatên wan yên edebî û li ser berhemên wan yên edebî û lêkolînî rawestin. Di vê hejmarê de em bi nivîskarêne Kurd yê navdar birêz M. Emin Bozarslan dest pê dikin. Di hejmara bê de, Gabbar Çîyan, Medenî Ferho..... û herwiha dê bi yên din berde-wam bike.

Kovara Helwest, helwesta naecibandinê nîşan nade. Di her nivîsê, di her berhemê de kedek heye. Kovara Helwest ji vê keda mejî re hûrmet nîşan dide. Her berhemek edebî li gor xwe xwedîyê qîmet û rûmetê ye. Kovara Helwest, dê helwesta

## **Helwesta Rexnegiriyê**

---

rexneyên ku kêmanîyan bibîne, rexneyên ku rê nîşan bide, rexneyên çêkirinê ji xwe re bike bingeh. Rexneyên xirabkirinê, yên hesûdîyê, yên naecibandinê û pozbilindiyê dûrê kovara Helwest in. Rexneyên weha tu feydeyek ji çand û edebîyata Kurdî re nayine.

Kovara Helwest, dê di hêla mineqeşe û rexnegiriyê de bibe çirîskek, bibe meşaleyek. Kovara Helwest bi naveroka xwe ya mineqeşan û rexneyan dê ji bo pêşveçûna çand û edebîyata Kurdî xizmetek bike. Jîyan bi mineqeşe, rexne û helwestên rast pêşve diçe.

Ji bo hejmara duyemîn em li benda pêşniyaz û rexneyên we ne. Ji me re nivîsên mineqeşe û rexneyan bişeynin. Nivîskarên Kurd yên nûh ku xwerû bi zimanê Kurdî dinivîsînin, kovara Helwest ji bo we firsendek e, îmkanek e. Berhemên xwe yên nûh, nivîsên xwe yên pak ji kovara Helwestê re

bişeynin. Vê tişti jibîr nekin; Nîvîs ji bo weşandinê, ji bo ku bê xwendin tê nivîsandin.

Kovara Helwest, dê berhemên nivîskarên Kurd yên nûh derkefî ji xwendevanan re bide danasînê. Di beşa "Cîhana Pirtûkan" de, dê bi giranî li ser berhemên nivîskarên Kurd yên nûh bisekine. Bi rexneyên çêkirî yên dostanî van berheman şîrove bike, xeta û kêmanîyan bi dostanî raxe holê ku ew nivîskarên nûh di afirandinê xwe yên din de xwe ji van xeta û kêmanîyan rizgar bikin. Aligirê wan yê herî mezin bi rexneyên xwe yên dostane û çêkirî, bi helwesta xwe ya rast ya îlmî-zanîstî, dê kovara Helwest be.

Hetanî hejmara duyemîn hûn bimînin di xweşîyê de xwendevanê ezîz û delal.

### **Kovara Helwest**

# **REXNEYÊN EDEBÎ**

## **Û**

# **VALAHÎYA REXNEGIRIYÊ**

**Lokman POLAT**

Edebîyatek têkûz hêza xwe ji rexnegirîyê distînê. Rexne edebîyatê pêşve dixe, jê re rê vedike. Edebîyat bi rexne xurt dibe, devlêmend dibe. Cûre - cûre rexne hene. Rexneyên pûç û vala, rexnên xirabkirinê tu feydêk nade edebîyat û hunerê. Lê, rexnên îlmî, zanîstî, rexnên objektîf gelek feyde dide edebîyatê û nivîskarên edebî.

Ji bo edebîyatek nûjen, ji bo pêşveçûna çand û hunerê rexneyên zanîstî gelek pêvîst e. Di edebîyata Kurdî de hêla herî vala rexnegirîye. Valahîya rexnegirîyê gelek astengan bi xwe re tîne. Çand, huner û edebîyat bê rexneyan pirs û pirsgirêkê xwe çareser nake.

Gelek pirtûkên helbest, roman û çîrokên Kurdî derketin. Her sal yên nûh têñ weşandin. Li ser van pirtûkên heyî kesek dengê xwe nake. Pirtûkên çawan in? Naveroka wan li ser ci hatine avakirin?, zimanê wan yên edebî çawan e?.. Ne başî û ne xirabî kes qal(behs) nake, nanirxînê, rexne nagrê. Heger li wan pirtûkan bi çavekî zanîstî û objektîf rexne bêñ kirin, dê nivîskarên wan pirtûkan ji wan rexneyan ders derxin, xwe ji şasîtîyan rizgar bikin û dê berhemên hîn baştir biafirînin.

---

## Rexneyê Edebî

---

Pirtûkek ne tenê malê nivîskarê wê ye. Xwedîyê pirtûkê nivîskar, xwendevan û rexnegirê wê ye. Wek ku **Mehmed UZUN** jî dibêje: «Sê xwedîyê kitêbeke edebî hene; nivîskar, xwendevan û rexnegir. Nivîskar kitêba xwe diafirînê û diweşînê. Piştî ku kitab weşîya, ew xwedî diguhêrîne û xwendevan dibe xwedîyê kîtebê û bi xwendin û dîtinên xwe li kitêbê xwedî derdikeve û wê dike nemir. Herçî rexnegir e, ew di navbera nivîskar û xwendevan de pireke xurt e. Ew pireke welê ye ku herdu alîyan digihîne hev û alîkarî li herdu alîyan dike da ku nivîskar hîn çêtir binivîse û xwendevan hîn çêtir bixwîne. Bi vî awayî rexnegir alîkarî li jîyana edebî dike da ku ew hîn geştir, xweşîr, pêşkeftîtir û kûrtir bibe.» Kar û xebata rexnegirîyê hêsan nîne. Zehmet e. Lê ev karê zehmet, ji bo ku jîyana edebî pêste dixe, karekî pîroz e. Divê bê kirin.

Rojname û kovarên Kurdan hema bibêje hemû jî yên sîyasi ne. Bi giranî nivîsên sîyasi û teorîk di wan de têne weşandin. Ev nivîsên teorîk yên sîyasi hemû jî bi zimanê tirkî têne nivîsandin. Di wan kovar û rojnaman de çend rûpel bi Kurdî ne. Ev rûpelên ku bi Kurdî ne jî, yan helbest û çîrok, yan jî nivîsên virde, wêde têde hene. Nivîsên li ser pirs û problemên edebîyatê pirr kêm têne weşandinê. Danasîna rojname, kovar û pirtûkên Kurdî nayêñ kirin. Çi heyfe ku di hîn kovar û rojnaman de kovar û pirtûkên Tirkî têne nasandin. Di rûpelên çand û edebî de nivîsên li ser edebîyata tirkan û bi zimanê tirkî têne weşandinê. Min wexta ku vê nivîsê dinivîsand çend kovar û rojnamên Kurdan ji min re hatin. (Ez abonê hemû kovar û rojnamên Kurdan im. Hemûyan–yêñ xwerû bi Kurdî û yên bi Kurdî–Tirkî– hejmar bi hejmar dixwînim.) Di van hejmarêñ rojnamên Kurdan de helbestvanêñ bîyanî dabûn danasînê, kovarêñ çandî û edebî yên Tirkan dabûn danasînê. Min jî qelema(pênuşa) xwe girt destê xwe û kovara çandî û edebî ya Kurdî, Nûdemê hejmar 12

---

## Rexneyêñ Edebî

---

nivîsand û wê da danasînê. Li gor bîr û bawerîya min, divê em ewil kovarêñ Kurdan, nivîskar û helbestvanêñ Kurdan bidin danasînê.

Li cem nivîskarêñ tirkan, di nav edebîyatnasêñ wan de wek usul e, nivîskarêñ wan yên bi nav û deng wexta pirtûkek diweşîne, li ser wê pirtûkê gelek nivîs tê nivîsandin. Li cem me nivîskarêñ Kurdan ev jî tune ye. Nivîskar nas be, bi nav û deng be jî, wexta pirtûk diweşîne kesek li ser wê pirtûka wî tiştek nanivîsîne. Nivîsek an jî du nivîsên îstîsna ne têde, nivîsên rexneyê nayê nivîsandin. Li ser pirtûkê bêdengîyek çê dibe, hetanî ku nivîskar pirtûkek din biweşîne. Di nav Kurdan de (Kurdistan Bakûr) nivîskarêñ ku xwerû bi Kurdî pirtûk dinivîsînin û yên ku di hêla edebîyatê de bi nav û deng in, yek ji wan **Mehmed UZUN** e û yê din jî **Firat CEWERÎ** ye. (Yên din jî hene, ezê wek mînak li ser van herdu nivîskarêñ xebatkar yên edebîyata Kurdî bisekinim.)

Li ser pirtûkêñ van herdu nivîskarêñ Kurd çend nivîsên edebî hatine nivîsandin?. Pirtûka Firat Cewerî ya dawîyê **“Kevoka Spî”** ye. Li ser vê pirtûkê çend nivîsên rexnegirî û danasînê hatin nivîsandin. Min bixwe çar pirtûkêñ kurteçîrokan nivîsand û weşand. Xeynê du nivîskarêñ rojnameya **WELAT** (Ev herdu nivîskar **S. Berbang û Murat Yergîn** bû, ez ji wan re sipas dikim.) başqe tu nivîskarek nivîsek nenivîsand. Erêni an neyêni kesêk tiştêk negot, gelo ev pirtûk çawan in?, basın an xirab in?, xurtî û qelsîya wan di kîjan warî de heye?, di hêla naverok, ziman û temaya çîrokan de kêmanî ci ne? û hwd. kesek nenivîsand.

Rexneyek pozitîf, dibe alîkar kû kêmanî ji holê rabin. Ev rastîyek zanîstîye, têt gotin ku; Çavêñ jîyana edebî rexnegir e. Xurtîya edebî bi rexnegirîye ve girêdayî ye.

# HUNER Ú PÊVAJOYA NÛ

**N. ZAXÛRANÎ**

Di van deh salên dawî de di dîroka gelê Kurdistanê de serdemeyeke taze hat destpêkirin. Tevgera rizgarîxwaz xwe bi hemû awayî nûjen dike. Bê dengî û qarîtî li seranserê Kurdistanê têt şikandin. Hestênetewî bi gîyan (rih) û can dibin. Dînamîkên civata Kurdistanê weke kulîlkên bihara rengîn ku li Newala Bunîsran geş û bal dibin, di hemû warê jîyanê de vedijîn. Serdema tevgerên netewî yên heremî ber bi dawîya xwe diçe. Şax û perên tevgîra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê weke rojên biharê bi gûmgûm û qérîn xwe davêjin ser deşt û newal, bajar û gundêne Kurdistanê. Êdî dîroka gelê Kurdistanê ya serûqûnî û serberjêr li ser lingên xwe kêlî bi kêlî bi rêk û pêktir têt rawestandin. Refêne tevgera rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê bi hemû çîn û refêne civata Kurdistanê kêm-zêde têne xemlandin.

Ji alîyê din ve jî Kurd hêdî bi hêdî ji bin nîrê bîyanîya dijminêne Kurdistanê di hemû warê jîyanê de dûr dikevin. Rewşenbîrên me li xwe vedigerin, xwe baştır nas dikin. Pêt û tîrêjên tevgîra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê êdî di navbera çeperên netewî de nahilin, di serpêhatina jîyanê de rengekî navnetewî digrin. Her weha welatê me Kurdan, Kurdistan ya bê statû û dabeşkirî bi neqşa xwe ya rengîn di televîzyon û çapemenîya cîhanê

## Huner û pêvajoya nû

de têt belav kirin. Îdî dewletên kolonyalist yên ku Kurdistan di nav xwe de parkirine, nikarin weha bi hêsanî tevgerên demokratik û bi reng mirovantî yên cîhanê bixapînin û di tarîtiyê de tevgêra berxwedanê ya gelê Kurdistanê serkût bikin.

Bê guman ev pêvajoya taze ya ku li Kurdistanê bi hemû awayî şax û per daye, divê ku ji alîyê hunermendê Kurdistanê ve bi çesnên hunerî, bi estetîkên netewî ji bê xemlandin. Ji xwe ev pêvajoya nû ji bo afirandina berhemên hunerî ku bi destêن hunermendê Kurdistan berhemkirin, rewšeke rengîn lidar dixe.

Lê belê, berîya ku mirov dest bavêjê afirandina berhemên hunerî divê ku mirov berîya hertiştî xwedîyê nerînek e zanyarî be di dorbera (derheqa) pirsgirêkên hunerî de di serpêhatina dîroka huner de bi awayekî tekûz, da ku mirov karibe xwe ji çewtî û kîmasiyêن hinek hevalên “hunermend” ku bi zanîn an jî bê zanîn ketinê de, bi peyva hevrî **A. Gramscî** “kathersîs” bike. Bi peyvek din xwe pak bike. Lewra dest nışandana konaxa “kathartîki” ji bo felsefa praksîs destpêkeke pirr girîng e. Girîngîya wê ji vê yekê tê; Mirov bi saya têgihîştina pêvajoya “kathartîki” karê bi awayekî dîyalektîkî pirsgirêkên civakî, dîrokî û hunerî şîrove bike. Çîko pêvajoya “kathartîki” bi zincîra geşbûna dîyalektîkê ve diqunce. Ji hev vewejiartina xelekên zincîrê li ser şahrazabûna mirov dimîne.

Bê guman divê konaxa dîrokî û pirr kiritik de ku welatê me Kurdistan têde dijî, berîya hemû tiştî pêwîst e ku berhemên hunerî xwedîyê rolekî “katharsîs” bin da ku berhemên hunerî bi mijarêن xweyî bi reng civakî karibin hîmîn tevgêra rixgarîxwaz ya gelê Kurdistanê bi gelek alî analîz bikin. Her weha divê ku berhemên hunerî bandora (tesîra) tevgêra rixgarîxwaz ya gelê Kurdistanê li ser keç û lawêن Kurdistanê dest nışan bidin bi vî awayî mirov bibe xwedîyê zanînekê bê ka tevgêra rizgarîxwaz çîqasî keç û lawêن Kurdistanê perwerdekirine û bi ci awayî û ta ci musteweyî hiştîye ku li xwe veger in. Bi alîkarîya van krîterên ku li jor hatin dest nışankirin, mirov karê bingehê bandora polîtika dijmin ku li ser binyata asîmîlasyonê têt avakirin xwe tê bighîne û bi vî awayî jî bê keç û lawêن Kurdistan ta ci musteweyî li ziman, huner û dîroka xwe xwedî derdikevin, divê ku ji alîyê hunermendan ve bê geşkirin. Ji xwe ev pêvajoya ku bi xwîna keç û lawêن Kurdistanê yên bejn taze ku ji bo azadî û serfîrazîya niştîmana xwe têdikoşin û

## Huner û pêvajoya nû

ji bo vê yekê jî ji alîyê hêzên barbar yên dagirkerên tirk ve di zîndan, li bajêr û gundên Kurdistanê, li serên çiyayê Kurdistanê têr terorkirin û her weha bi şîn û hêstirêن dayîkêن me Kurdan ku ji bo lorikêن xwe dîbarînin têt neqîşandin, bi qasî ku têt xwîyakirin berhemênu ku divê demê de ji alîyê hunermendênu Kurd ve têr berhemkirin, naveroka wan bi mijarênu ku serçavîyênu xwe ji cîvata Kurdistanê distînin, têr xemilandin.

Ji bo vê yekê jî wezîfa rexnegiran ya pêşîya pêşî ewe ku fikir û ramanênu ji alîyê hunermendan ve di berhemênu wan yên hunerî de hatîye hunandin, bi awireke bi reng civakî û bi pîrr alî li ser wan hûr û kûr bibe, da ku bi vî awayî berhema hunerî - bila çeşna wê ci dibe bila bibe jî- bi naverok û şêwa (şikl) bê pêşkêşkirin ji xwendevanê hêja û delal re. Di van dem û dewranên dijwar de ku dijminênu Kurd û Kurdistanê cengek e bi qirêj li pêşberî gelê Kurdistanê lidar dixe, bi hemû hovîtiya xwe bajar û gundênu Kurdistanê wêran dike, keç û lawênu Kurdistan yên çeleng ji bo dadana agirê rizgarîya niştîmana xwe berxwedanek e rengîn li welêt û derveyî welêt dikan. Bi gotinek din, êdî keç û lawênu Kurdistanê mîna bav û kalan ne bitenê çekan li pêşberî dijminênu xwe kar tînin. Ji bo têkûzkirin û xemlandina têkoşîna rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê hunermendênu me yên hêja gelek berhemênu delal û bi rûmet berhem dikan. Di vî warî de gelek mînak hene ku mirov karê li ser wan mijul bibe û bi vî awayî ji derd û kulan jihevrake jî, lê ez dixwazim ku hinékî li ser romana **Mehmed UZUN** ya bi navê "Sîya Evînê" rawestim.

Dema ku mirov romana "Sîya Evînê" dixwîne hingavê demek e kurt ji dîroka rewşenbirênu Kurdistanê ku ew bi xwe jî bireek ji birrê dîroka tevgêra rizgarîxwaz ya dûr û direj e, têt berçavênu mirov. BI saye xebatek e dijwar û bêhempa ya **Mehmed UZUN** mirov dibe xwedîyê nerînek e bi rêk û pêk dorbera xebata ronakbîren Kurdistanê yên wê demê.

Di romana "Sîya Evînê" de jîyana rewşenbirêkî Kurd ku ji bo serfirazîya niştîmana xwe di dema xortanî ya xwe de têkoşînek pîrr dijwar li pêşberî hovîtiya Kemalistên barbar daye, ji alîyê nivîserê romana "Sîya Evînê" ve bi zimanekî xweş, bi peyvîn xwe yê hilbijartî ku darîstanâ hevokan mîna keçen Kurdistanê yên xwedîyê çavênu reş, bejn bilind û lihevhatî, bi çavan kezîyênu xwe yên reş û

## Huner û pêvajoya nû

dirêj dihonin, weha jî nivîser romana xwe li dorberê jîyana **Memduh Selîm** Begê hunandîye. Ji bilî vê jî nivîserê romanê di nav şaxê perên jîyana **Memduh Selîm** Begê de kar û barê polîtîkî ku ji alîyê rêxistinê me Kurdan yên wê demê dihat kirin, bi hinek rexneyên di cîhêن xwe de naveroka romana xwe xemilandîye.

Lê gelek mixabin vê xeml û xêla wê ya ku bi motîvên cîvakî ku bi herkendina romanê ra hatina vegotin, çeşna edebî ya romanê gelekî qels û tengezar kirîye. Ji ber vê yekê jî mirov kare bi hêsanî bibeje ku çeşna romanê ya edebî ji rengekî hunerî behtir rengê pirtûkeke nîvdîrokî standîye. Her çiqas birêz **Mehmed UZUN** ji ber vê endîşa xwe ku dibêje: "Ji ber ku tarîxa gelê Kurd û welatê Kurdistanê, bi darê zorê hatîye guhertin. Kurd ji tarîxa xwe bi dûr ketine, bi gotinek din ew hatine bi dûrxistin." (1) Mafdar be jî divê ku bi tu awayî motîfên polîtîkî, cîvakî û dîrokî ku ji alîyê nivîserekî di berhemên xweyî edebî de bi kar tîne, nebin hoyê ku çeşnên edebî di nav şax û perên wan de bêñ winda kirin. Ger weha bibe hingavê berhemên hunerî bi çeşnên xweyî edebî qels dibin.

Ji bo ku di vî warî de pirsgirêk baştir bê têgihîstin û fireh bê ve-wejartin pêwîst e ku mirov xwe li ser mijarê hûr û kûrtir bike. Berîya niha bi çendekî "**Jîyana Nû**" ket destê min. Di nav rûpelên "**Jîyana Nû**" de nivîsek e bi zimanê tirkî ku ji alîyê hevrê Hesen Asgar ve bi navê "Pakkirin di şoreş û huner de" hatibû nivîsandin li ber çavêñ min ket. Kêmasiya ku di "**Sîya Evînê**" de xwe dabû xwîyakirin û min di rêzên jorîn de balkışand e ser hevrê Hesen dixwazê ku vê kêmasiya ha bi vegotina xwe kronik bike, weke tiştekî zanyarî "teorîze" bike û bi vî awayî bi me bide pesend kirin. Lewra ew dibêje ku; "Di şertên me de, dev ji meylêñ ku hemû fonksiyona huner dixin mistewa hazê bê berdan ji hunerê ku alîyê wî yên geşkirin û pakkirinê derneketibin ber bi pêş, nabe hunerî şoreşger." (2) Bi rastî mirov hinekî şaş dike. Rast e, ez jî bi te re ku fonksiyona huner bi yek alî bi tenê bi hazê ve bêñ sînorkirin, wê demê berhemên hunerî ji jîyana cîvakî a xeml û xêzên wê dûrdikevin û bi wî awayî têñ abstrakkirin. Ji xwe rexnegirê û idealîst yên bi ser ekola Hegel ve nerîneke wilo diparastin û dixwestin ku berhemên hunerî bi îmajan bêñ xemlandin. Ji alîyê din ve jî ku mirov li te guhdarî dike û dibîhîze ku tu dibêjî "..... hunerê ku alîyêñ wî yên geşkirin û pakkirin derneketibin ber bi pêş

## Huner û pêvajoya nû

nabe hunerê şoreşgerî" wî çaxî ji berhema hunerî ji kirasê xweyî hunerî derdikeve û dibe fenomenek e civakî, felsefî an jî dîrokî hevrê can!

Lewra baş têt zanîn ku dema fenomenên olî, felsefî û polîtîkî di naveroka xwe de bûne xwedîyê uslubekê û bi alîkarîya zimanekî pak û zelal hatin vegotin, wê demê mirov kare van fenomenan mîna berhemên edebî pesend bike. Anjî ku mirov bi balek e fereh û kûr kare bibeje ku fenomena edebî pêşkêşkirina fikrane bi awayekî îmajkî. Her fikir bi xweza ya xwe nûnerkirina (temsîlkirina) bûyerên bi reng beşerî ye, ku ew jî mirov bivê-nevê di dawîya dawîn de xwedîyê rexnek ji rengê jîyana cîvakî ye. Di bingehê xwe de obje (kirde) edebîyatê jîyana mirovantî bi xwe ye.

Lê ku mirov nivîsandina hevrê Hesen Asgar bi rêk û pêk dixwîne, hingavê bi hêsanî têt xwîyakirin ku metna nivîsandina wî mîna gundîyêن Kurdistanê ku ji tirsa çûkan zevîyêن xwe bi himbiz tov dîkin, weha jî vîna di teksa nivîsandina xwe de polîtîka heta ku jê hatîye reşandîye. Bi vê reşandina wî ya bi himbiz hiştîye ku pêlên polîtîkê di nava xwe de pêl û xemlên hunerî bi carekê winda kirine. Ji ber vê yekê ji motîfîn polîtîkî di nava nivîsandina wî de bi awayekî tazî tên xwîyakirin. Ji vê yekê wîrdetir ji peywendîyêن rast û rê (dîrekt) di navbera kategorîyêن estetîkî û polîtîkî de tên danîn. Bi vî awayî jî mirov bivê-nevê kategorîyêن estetîkî kategorîyêن polîtîkî taqlîd dîkin. Bîteqlîdkirina kategorîyêن polîtîkî ji alîyêن kategorîyêن estetîkî ve xweserîya (otonomîya) huner ji holê radibe. Ci ku berhemên edebî ne belge ne ji bo ku mirov derd, kul û meremên xweyî polîtîkî bi alîkarîya wan çareser bike.

Ji alîyê din ve jî divê baş bê zanîn ku huner, polîtîka û dîrok asîmetrîkin. Her çiqas birêz **Mehmed UZUN** hewl dide ku şêweyê nivîsandina xweyî bi reng nîv dîrokî ku di romana xwe ya bi navê "**Sîya Evînê**" de bikaranîye bi alîkarîya Marguerîte Yourcenar ku ew ji devê wî digre û ji me re dibêje: "Her roman di esasê xwe de romanekê dîrokîye." Xwe mafdar bike jî, rastîya jîyana cîvakî vê yekê serrast nake. Ci ku fenomenên hunerî û dîrokî ne sen-kronîkin(hemdemî). Bi gotinek din, fenomenên dîrokî û yên hunerî ne hevdem in. Rûdenêن wan di serpêhatina dem û dewranan de li hev naquncin. Ev taybetîya ha jî di civatêن cûda de bi awayêن cûda têt xwîyakirin. Ji xwe ku mirov vê pêvajoya ha ku li

## Huner û pêvajoya nû

Kurdistanê hatîye li darxistin bi nerînek e baş analîz bike, hingavê mirov dibîne ku herikandina pêvajoyê bi xeml û xêzên xwe yên dîrokî, politîkî û estetîkî vê yekê ji bo me serrast dike. Ci ku her mirovê ku balê xwe baş dabe ser serdemâ nû ya ku niştîmana me Kurdistan di navbera pêlên xwe hêşîye dibîne ku pêvajoyeke gelekî dijwar û jîndar e. Dezgehên politîkî gelek çalak in. Berxwedanê gelêrî ji Botanê ta Kelha mîran Nisêbîna rengîn û ji wir heta Dêrsima cengewer pêkolîya dewleta tirk ji binî ve dilerizîne. Rengîn kesk, sor û zer di şûna eprîyên Muhamedî de pîsk û kezîyên keç û bûkê Kurdistanê dixemilînin. Ji bilî vê jî hêzên netewî yên çekdar li pêşberê hêzên dijmin cengeke man û nemanê dijkin. Gelê Kurdistanê bi vê xebata xweyî rengîn heyameke nû li bakûrê Kurdistanê vedijîne. Newroza bapîrê me ya KAWAYê hesînker bi awayên nûjen têt pîrozkirin.

Lê, li milê din jî ku mirov li rewşa ziman, edebîyat û bi giştî çanda gelê Kurdistanê temashe dike bi rastî rewş gelek kambax û wêran e. Bê guman bingehê vê kambaxbûn û wêrantîyê bi destê dijmin bi sedên salan hatîye avêtin. Ji bo vê yekê jî hunermend û filozofê mezin **Ehmedê Xanî** berîya niha bi sedan sal bi têgihîştina xweyî zehayî balkışandiye ser pirsgirêkê. Ci ku çareserkirina pirsgirokê ji bo hebûna gelê Kurdistanê jîyanî ye. Ji bo ku gelê Kurdistanê di warê jîyana hunerî, edebî, felsefî û yên din de bê par bê, divê ku rewşenbîrên Kurdistanê di vî warî de gelek zana, çalak jîr û çeleng bin, da ku karibin ziman û edebîyata xwe ji vê rewşa wêran rizkarkin. Vêca pirsgirêk hêdî bi hêdî ronî dibe. Kurd roj bo roj ji dewleta tirk di warê sîyasî de qut dibin. Bi vê qutbûnê ra jî dîroka wan nûjen dibe. Lê kî karê bêje ku Kurdan di warê ziman û edebîyatê de xwe bi nûkirine. Ji ber vê yekê jî mirov karê bi hêsanî bêje ku dîrok û huner di herîkandina dem û dewranan de ne hevçax in. Lê têkilîyê di navbera wan de mîna goşt û xwînê bi gîyan (rih) û can in.

Bi rastî, ji bo ku mirov karibe vê pêvajoya ku li Kurdistanê hatîye li darxistin bi hemû motîvê wê yên bi reng cîvakî, politîkî, felsefî, edebî û her weha di warê zimên de jî karibe rola ku ji mirov têt xwestin bileyzê. Divê ku mirov pêşîya pêşî ji bo zimanê gelê Kurdistanê -ku ew jî xwedîyê çar zaravan e- li rewşenbîrên Kurdistanê bixe hawar û qêrin da ku zimanê me yê şérîn û kevnar ji vê rewşa

## Huner û pêvajoya nû

kambax bê rizgarkirin. Ci ku piranîya rewşenbîrên me- ci yên xwedî rêexistin û ci yên “bê alî” — hê ji bi zimanê tirkî di rojname û kovaran de dinivîsinin. Ev yeka ha bi serê xwe nakokîyek e mezin e. Ji alîkî ve emmê doza berhemên hunerî yên ku vê pêvajokê bi kûrahî û ferehîya wê tînin zimên bikin, lê ji alîyê din ve wê berhemên me yên hunerî xwerû bi zimanê tirkî bêñ nivîsandin. Ma qey mirov kare bi zimanê tirkî motîvên estetîkî yên netewî bi afrîne? Bi ya min na! Ci ku metnên edebî ji bo pesendkirin û pêşxistina meremên polîtîkî - ku ya kolonyalîstan ew e bê asîmîlekirin - ne bi tenê bikaranîne şeweyle (şikl) zimên girêdayî ye, her weha bê ku van ziman jî têt bikaranîn ji bo gelê Kurdistanê girîngîyek e jîyanî ye.

Di vê pêvajoyê de pêwîst e ku rewşenbîrên Kurdistanê - bi ci awayî bibe bila bibe jî - di xebata xweyî çandî de zimanê dayikêñ xwe bikarbînin, da ku estetîkên netewî li seranserê Kurdistanê bêñ vejandin. Her çiqas ziman weke organekî bê gunih têt xwîyakirin jî, di rastîya jîyana cîvakî de weha nîne. Lewra zimannasî di her dem û dewranan de bûye arêna ji bo pevçûnen bi reng polîtîkî di navbera gelê zordest û yên çawsawa de. Dîroka gelê Irlandî û ya gelê Cezayîrê vê yekê serrast dike Edebîyat bi xwe jî him dibe hoyê van pevçûnan him jî dibe netîce wan di serpêhatina dîroka gelê welatan de. Ji xwe dewletên kolonyalîst ji bo ku karibin nîrê xwe yê koletîyê li ser gelê çawsawa bidomînin, edebîyat ji bo pesendkîrina îdeolojîya wan aletekî bê hempa ye. Ma gelo dîroka zimanê tirkî ku bûye zimanê netewî ji bo zimanê me Kurdan ne dîroke kolonyalîzmê ye? Bi ser de kolonyalîzmeke har û bê hevsarkirî ye. Ji bilî vê jî bela ku gelên rojhilata Navîn - tirk, ereb, fars û kurd - bi hezarêñ salan di nav hev de dijin, gelek tiştêñ wan di warê jîyana cîvakî de bûne wekhev. Ji xwe ola İslâmê li ser wan netewan ola herî zal e. Vê zalbûna ola İslâmê rabûn û roniştina cîvakî ya tirk, kurd, fars û ereban gelekî nézikê hevdû kirîye.

Lê di roja îro de, zimanê me Kurdan me ji wan netewên Rojhilata Navîn cûda dike. Ji ber vê cûdakirinê jî Kemalîstan zimanê me qedexe kir in. Medresên ku ji alîyê melayê Kurdan dihatin vekirin û di wan de bi zimanê Kurdî perwerdekirin jî tefsîra quranê bigre heta felsefa **Eflatun** (Platon) dihat xwendin, ji alîyê Kemalîstan bi mehma rê li ber “Îrtîca dîni” girtin, kilît li deryêñ wan hat xistin. Ji

## Huner û pêvajoya nû

xwe xwendegehêن me yên nûjen ji bê mealî nihatîn vekirin. Zimanê me bi saya kevnariya xwe ku rayên xwe berdana nav kûrahîya dîrokê heta niha hebûna xwe didomîne.

Divê ku rewşenbîrên Kurdan çi bikin bila bikin li vê hebûna zimanê xwedî derkevin. Lê, li gorê min xwedî lê derketin ew e ku zimanê me ji alîyê ronakbîrên Kurdistanê ve di hemû warêن jîyanê de bê bikaranîn. Bi pêkanîna vê yekê "praktîka" **Ehmedê Xanî** têt bicîhkîrin. Li paşxistin an jî jibîrkirina vê "pratîkê" derî ji asîmîlasyona kolonyalîstan re vekirin e. Ev yeka han jî bê pirsyâriyeke dîrokî bi xwe diafîrîne.

Gelî rewşenbîrên Kurdistanê !

Ji bo ku em nebin sersebebê vê bêpîrsîyariya bê pîrsîyarî pênuşêن xwe ji bo cîhkirina "pratîka" **Ehmedê Xanî** tûj bikin da ku "**Ronesansa Kurdi**" bê xemlandin.

### Serçavîyêن pirtûk û kovaran/Çavkanî

1—Hêz û Bedewîya Pênuşê - Rûpel: 162

2—Jîyana Nû - Rûpel: 11

3—Hêz û Bedewîya Pênuşê - Rûpel: 148

# MUZÎKA KURDÎ QEDEXEBÛN Û PÊSTECÛN

Senar ŞAHÎN

Kurdistan welatekî zêrîn e. Bi her awayê xwe ve dewlemend e. Madenên ser erd û bin erdê (Petrol, Paxir, Av û hwd.) karêñ zîraî û çandînî, bi kurtî aborîya Kurdistanê têrê çend welatan dike. Di hêla çand û folklorî ya gelêrî de jî dewlemendîyen gelek mezin hene. Zargotina Kurdî, kilam û stranê Kurdî pirr dewlemend e. Stranê Kurdî ji dîroka qedîm taa îro haşîye, jîya ye. Di tu demî de, tu kes nikaribûwe rê li pêşîya stranê Kurdî yên gelêrî bigire.

Ji dema dewleta Alî Osman bigir, hetanî dewleta Kemalîstêñ Faşîst li ser zimanê Kurdan, li ser muzîka Kurdî her tim zor û tehda hebûwe. Dewleta Kemalîst a Faşîst 70 sal hebûna Kurdan, stran û muzîka Kurdan qedexe kir. Lê cîsa jî bi vê qedexekirina xwe nikaribû rê li ber pêşveçûna ziman û muzîka Kurdî bigire. Di dema Turgut Ozal de dewleta tirk mecbûr ma ji nav zagonêñ xwe yên fermî madeya qedexekirina zimanê Kurdî rakir û muzîka Kurdî ne fermî be jî serbest kir. Lê nûha di dema Suleyman Demîrel û Tansu Çîler de dîsan dixwazin ziman û muzîka Kurdî qedexe bikin.

Muzîka Kurdî, muzîkek folklorîk û gelêrî ye. Ji dema qedîm ve tê. Ji nav kurahîya dîrokê derketîye, pêl daye û ta îro haşîye. Dewleta Tirk kîjan metodê bi kar tînê bila bînê, kîjan astengan derdixe bila derxe, nikarê rê li pêşîya pêşveçûna muzîka Kurdî bigirê.

## Muzîka Kurdî

Di van demêñ dawî de zor û zilma dewleta tirk li ser şirketên plak û kasetçêkirêñ Kurd gelek zêde bûne. wezîrêñ çandî yê dewleta Tirk belgeyêñ heft (7) şirketên kasetçêkir yêñ Kurd îptal kir. Dewleta Tirk bi vê hawayî dixwaze derbeyek mezin li kasetçêkirêñ Kurd bixe. Şirketên muzîkê ji ber îptalkirina belgeyêñ wan û qedexekirin û civandina kasetan gelek zirara aborî dîtîne. Şirketên ku belgeyêñ wan yêñ kasetçêkirinê îptal bune evin: Stran Muzîk, Dîyar Muzîk, Sevkan Ticaret, Kaya plak û kasetçîti, Mazlum Plak, Ozdemîr Plak, Ataman Plak.

Gelek kasetçêkirêñ din jî, ji alî dewleta dagirker ve hatine balkışandin. Dewletê bala wan kişandîye ku ji nûha û pêve hendî kasetên kurdî çenekin, neweşînin. Kasetên Kurdî yêñ ku ji alî dewleta dagirker a Tirk ve belgeyêñ wan yêñ weşanê îptal bûne û hatine qedexekirin û ji alî polîs ve hatine civandin - çend ji wan kasetan- navê wan evin: Ahmedo Ronî, Aram-2, Werin Dawetê, Dinya Fanî, Min Helalke, Hozanêñ Kurda, Sîyabend, Welatê Min, Helepçe, Yara Min, Lê Amedê, Serê Çîyan, Rabin Dîlanê, Welat Şêrîn e, Kulîlka Azadî, û Hevalê Min e.

Êrişa dewleta Tirk a li dij kasetên Kurdî perçeyek ji êrişa şerê wê yê gemar û qirêj yêñ taybetî ye. Ev heftê (70) sale ku dewleta Tirk li dij gelê Kurd zordarî û wehşetîyek bê hempa û hov (barbar) dimeşîne. Lê, dewleta dagirker a Tirk çikir, nekir bi qedexekirinê nikaribû pêşîya pêşveçûna muzîka Kurdî bigirê. Nikaribû, lewra gelê Kurd û muzîka Kurdî yek bû. Dengbêjên Kurd bi xebatêñ xwe yêñ hêja her tim muzîka Kurdî pêşte xistin, kilam û stranêñ Kurdî di nav gel de belav kîrin.

Muzîka Kurdî, kilam û stranêñ Kurdî hîmê xwe ji zargotina gelêrî distîne. Muzîka folklorîk a gelêrî hîmê muzîka Kurdî ye. Muzîka Kurdî li ser vê hîmê heşîn bûye, jîya ye. Qasetên Kurdî wexta derdikevin bi rîya fermî hendik têñ firotin, lê ji alî qere-borsacîyan têt zêdekîrin û di nav gel de belav dibo, bi mîlyonan têt firotin. Dewleta dagirker a tirk çibke jî nikarê firotin û belavbûna kasetên Kurdî di nav gel de ji holê rake. Netewa Kurd çawan bi hîs û şûûra netewî li doza xwe xwedî derdikevê, weha jî li zimanê xwe, li çand û wêjeya xwe, li muzîka xwe xwedî derdikeve, wê diparêze.

# REWŞA NIVİSKARÊN KURD

Cîhan DILŞAD

Rewşa nivîskarêñ Kurd baş nîne. Ew di nav gelek zehmetîyan de dixebeitin û berhemên xwe diafirînin. Ji bo afirandina berhemên wan gelek astengêñ madî û teknîkî hene. Weşandina berhemên edebî wisan hêsan nîne. Nivîskarêñ Kurd ji bo rewşa aborî ya malbata xwe, mecbûrî rojê 8 saet kar dikan. Bi şev û rojêñ şemî û yekşemê jî karê nivîsandinê û xwendinê dikan. Çend nivîskar netêde, yên din hemû jî bi amatorî karê xwe yê nivîskarîyê berdewam dikan. Ji ber gelek sedeman, di serî de jî ji bo dabaşa malbata xwe, nivîskarêñ Kurd nikarin xebata xwe ya nivîsin û nivîskarîyê bi profesyonelî bimeşînin. Di hêla weşandina pirtûkan de jî rewşa nivîskarêñ Kurd wek yên neteweyêñ din nîne. Ew bi hêsanî pirtûkêñ xwe diweşînin, lê yên Kurd piştê gelek asteng û zehmetîyan pirtûkêñ xwe diweşînin.

Ez dixwazim livir mînakek bidim; Nivîskarêñ Kurd bi keda mejîyê xwe pirtûkêñ xwe dînîvîsin, paşê mîzampaja wê çêdîkin, paşê bergên pirtûkê amade dikan, piştre ew bi xwe dibin çapxanê, li ser çapê disekekin, piştê çapê pirtûkan hel-digrin tînin malê, paşê ew bi xwe pirtûkêñ xwe belav dikan, difroşin, bi pirranî jî bê pere belav dikan, dîyarî dikan.

Lê yên bîyanîyan weha nîne. Em bibêjin nivîskarê Swêdî **Jan Gulio**, pirtûka xwe dînîvîsine û dişeyne weşanxanê. Weşanxane pirtûkê redakte dike, zimanê wê rast dike, kesên wan yên grafîker bergên pirtûkê çêdîkin û amade dikan, û dawîyê pirtûkê çap dikan û belav dikan, difroşin. Heqê Jan Gulio jî didin pê. Yanî nivîskar **Jan Gulio** piştê nivîsandinê destê xwe nade tiştê, têkiliyê tiştek nabe.

Nivîskarekî Kurd wexta ku berhema xwe diafrirînê û pirtûka

## Rewşa Nivîskarêñ Kurd

xwe derdixe, mirov dibîne ku gelek rexne ji bo pirtûkê têt kirin. "Zimanê wê baş nîne" Tu dibêjî qey hemû nivîskar zimanzan in. Nivîskarî û zimanzanîyê dixin nav hev. "Berga wê xweş nehaşîye çêkirin" Nafikirin ku di nav Kurdan de çend kes krafîker heye, yên ku hene jî alîkarîya kesek dikin. Û her wek din gelek rexne tê kirin, lê kesek naftikire ku ev pirtûk bi ci hawayî û bi ci zehmetîyan hatîye amadekirin.

Di nav weşanxaneyên Kurdan de dezgehêñ xurt û têkûz tune. Di hêla aborî de dewlemend nînin. Kar û xebaiê van weşanxaneyên Kurdan wek yên bîyanîyan nîne. Redaktor û grafîkçîyêñ van weşanxanan tune ne. Ew jî hemû karêñ xwe bi amatorî dimeşînin. Çend weşanxaneyên li gor xwe mezin yên Kurdan hene, lê ew jî pirtûkên xwe diweşînin, yanî pirtûkên serokên xwe, pirtûkên kesêñ ji sîyaseta xwe diweşînin. Pirtûkên nivîskarêñ nûh naweşînin. Rê ji nivîskarêñ nûh re venakin, ji wan re nabin alîkar. Bi gelempêri têt gotin, an jî henîk kes dibêjin (gelek jiwan ji ber hesûdî û çavnebarîya xwe dibêjin) "Gelek weşanxaneyên Kurdan çêbûne. Her nivîskarek ji xwe re weşanxaneyek vedike û tenê pirtûkên xwe diweşîne." Ev tiştê gotin, lê yên ku van tiştan dibêjin qet fikirîyane ku sedemên vê tiştî çine?, divê mirov wî bizanibe. Tiştek din ji, li gor bîr û bawerîya min, weşanxaneyên Kurdan li gor weşanxaneyên neteweyên din qet ji pirr nînin. Her nivîskarek çîma weşanxaneyek vedike û pirtûkên xwe diweşîne? Gelo kesek li ser vê tiştî fikirîyaye?. Heger weşanxaneyên heyî yên mezin pirtûkên van nivîskaran biweşandana, dê wan weşanxaneyên nûh vebikirana?. Weşanxane vekirin di bin tekela henîk mirovan de ye ku ji derveyê wan divê kes weşanxane veneke? Divê mirov ser van tiştan bifikire û li bersîva wê bigere. Ji bo rewş bê fêmkirin ez mînakek bidim; Nivîskarekî Kurd pirtûka xwe dide weşanxaneyekî mezin, ji bo ku ew çap bikin. Pirtûk salek li weşanxanê dimîne, lê nahê çapkîrin. Dawîyê jî berpirsîyare weşanxanê ji nivîskar re dibêje "Wella perê me tune, em nikarin pirtûka te çapbikin." Ew nivîskar jî pirtûka xwe paşve digrê û diçe. Paşê ew bi xwe weşanxaneyek vedike û pirtûka xwe ew bi xwe çap dike.

## **Rewşa Nivîskarêñ Kurd**

Ji bilî van sedeman ji, bi a min çiqas kovar û weşanxaneyên Kurdan pirr hebin baş e, dê gelek pirtükên Kurdî derkevin, dê di kovaran de gelek nivîsên Kurdî bêne weşandinê. Pirrbûna kovar û weşanxaneyên Kurdî ji bo pêşteçûna çand û wêjeya Kurdî, ji bo dewlemendkirina pirtûkxana Kurdî tiştekî baş e. Zirara pirrbûnê ji tu kesek re tune. Henîk kes cîma li dij pirrbûna (ku li gor neteweyêñ din qet ji pirr nîne) kovar û weşanxaneyên Kurdan (ku ew bi xwe ji Kurd in) derdikevin mirov nizane.

Li pêşberê nivîskarêñ Kurd asteng pirr in. Ev asteng bi her awayî xwe nîşan didin. Ji astengêñ aborî bigir taa yên teknikî, gelek problem derdikevin pêşberê nivîskaran. Ji alî bazara pirtûkan, ji bo firotina weşanan de ji rewş baş nîne. Xwendevanêñ Kurd, kovar, rojname û pirtükên Kurdî nakirin, naxwînin. Pirtûkên ku nivîskarêñ Kurd derdixin li ser wan dimîne. Bi kurtayî mirov ji kîjan alîve ji binêre rewşa nivîskarêñ Kurd baş nîne. Cîsa ji xwezî bi wan ku li ber ewqas astengan û gelek zehmetî û bêîmkânîyan cîsa ji pirtûkên xwe derdixin, diweşînin.

**Gabar ÇÎYAN**

**BİROVA ÇAVAN**

**Derket**

**Weşanêñ JÎNDAN**

# Baxçeyê evînê

Çend roj in xemgîn im ez,  
bê çare û evîndar im ez  
birîndarê yara xwe me ez  
bi agirê wê dişewitîm ez  
Fermo şêrîn can  
bê pirs û gotin  
bigre dilê min  
bi meşe bê rawestan  
li ser riya evînê.

\* \* \* \*

Siwarek ji dûr ve tê  
weke ba û bahozê  
gelo nêz dibe evîn?  
an ji tev xeyal in ev!  
çi bikim ez?  
hey çavresê  
dilşikestî me  
nazenîn û sitûxwar  
bendewar im ez.

\* \* \* \*

Dest hatine girêdan  
hevsar li dev ketiye  
rê li min hatiye girtin  
ketim binê zindanan  
bê sûc, bê sebeb  
nanivsîne pêniyîs  
hatiye şikestin,  
şikestiye carekê  
ferman hatiye dayin  
fermaneke bê bext!  
li ser dilê min  
Ma tenê ev?

bêbawerî  
ji evînê, ji jiyanê  
terkeserî û xemsarî  
dilşikestî û bendewarî...  
Çi bêjîm ez!  
Çawa bêjîm?  
Bê ziman û bê çare me,  
tenê û xemsar...

\* \* \* \*

Lew ferman hatiye dayin.  
Fermana bêbext!  
Ez dê çi bikim?  
Lê nas nakim ez  
Bi his û giyan  
qebûl nakim ez.  
Fermanên bêbext  
sîtemkarî û sitûxwarî.

\* \* \* \*

Ji bo çi ava bûne  
çiyayênil bilind û deştên bêserî  
dar û berîn şîn  
jiyan û evîn?  
Ferman bide yara min  
em biçin baxçeyê evînê,  
hev nas bikin, hev bi bihîzin  
ji tîrsan dûr,  
bê xem û bê kul.

**Bawer Delîl**

# LI SER POST-MODERNÎZMÊ

Nîvîskar : Burhan GUNEL  
Werger : Lokman POLAT

Postmodernîstên me dişibînim çêkiroxê muzîka arabesk. Çawan ku arabeskvan dibêje "serîhildana min heye" û dinalê, lê bi rastî jî serîhilnada û arandin dike, mîzmizî dike. (Bê şik qirixên vê muzîkê hîn pirrtir mîzmizî dîkin.) Postmodernîstên me jî "Azadî..... Azadî....." dibêjin, medya, hêzên siyasi û aborî digrin nav dahvikê û jîyana ku di berê de hatîye amadekirin derbas nakin û bi rastî jî neazadîyê tînin ziman. Ew azadîyê naynin ziman. Ev ji bo yên ku bizanîstî postmodernîzmê diparêzin dîtinek e. Çi heyfe ku hêj nebûne ekolek, lê ji bo hevkarêن vê meylê cirra bûne postmodernîst nizanîn, di xewê de ne, razay ne, lê bi hewesa tevkarîya vê garana ku bi xwe çêbûye, dibin, loma jî firsende ne. Wexta min ji wan çend kesî gohdarî kir, bi şasî min nêrî ku, tu gotinen yekê we yên din nîne, dirûbê gotinê wan bi hev nakeve. Tiştên ku têt gotin nagihîse tîrkirin. Meyil û dîtinê bela wela, bi tenê li ser gotina "postmodernîzmê" li ser hev dicivîn. Ewqas.

Ronakbîrêن welatêن me, nîv ronakbîr, xwendevan û nîvîskar, ji herkandinê mode gelek hez dîkin. Li gor modeyê dibin cîvakî di vê welatî de. Dîsa ji bo modayê dibin parêzgerê komara duyemîn. Ji bo ku bibin avahîker

## Post - Modernîzm

(yapısalçı), bibin li ser rastîvanîyê(gerçekustucu) an jî bibin hebûnîtî(varoluşçu), bahêن rojavayê bes e, hewcê xwe êşandanek, kedek din nake. Armanç : “ Pêşevayê herkandina ..... rojava yên li Tirkîyê vana, vana, vanane.” bête gotin. Bi taybetî li gor şert û şûten Tirkîyê, li gor kirde û objeyan vana ji nav taybetî a gelempêri nikarin bigrin, taqlîta rojavayê dikin, hunermendêن ku berhemên teqlîti diafirînin, modayêن weha qet narevînin. Ku pêvîst be, di hemû jîyana xwe de dixwazin bibin pêşevayê vê modayê li Tirkîyê.

Tiştên ku ez li dij derdikevim, bê prensîpî ye, ev nêrîna kapkaçcîtyê ye. Nexwe ku rewşa welatê me ji bo kîjan herkandin pêvîst be, mirov li dij derkevê an dernekevê ev pêvîstî dikevê jîyanê. Û divê mirov bêhêlê ku bijî. Lê bi a min, postmodernîzm weha nîne. Him şert û şûten Tirkîyê li gor vê dest nade, û him jî postmodernîzm hêj li welatên rojava jî sînorêن wê nehatîye kifşkirin û nehatîye danasandin. Danasîna wê hêj baş çenebûye.

Herkandinek (Akîmek) li ser nebeylütîyê dibe?. Bê şik vê jî dê dem nîşan bide. Em hunermend ji bo ku pêhesek û hîskarêن cîvakê ne, di tiştên ku dem nîşan bide de, pêş bibînin û bizanibin, texmînbikin. Yaxwana em dê li paş cîvakê û gûherandinê bimînin.

Rojava li postmodernîzmê çawan mîze dike?. Ci dibêje?. Li jêr bi jê girtinan emê rewşê fêm bikin.

— «Di dawîya sala 1970'yî de, kaşo bi gotin “qrîza Marksîzmê” dihat gotin. Ku tesîra xwe li ser du tiştan dikirin. Di hêla teorîk de wek Baudrillard û Lyotard yên piştê Marksîzmê û teorisyenêن dijê Marksîzmê, li ser modernîzm û postmodernîzmê bi Marksîstan re ketin minaqeşê. Di salêن dawî de li ser postmodernîzmê minaqeşeyêن vekirî heye. Habernas, Jameson, Roty, Davîs, Berman û nîvîskarêن din besdarê vê minaqeşê bûne....

Li ser rola tevgerên cîvakî û çîna karkeran mineqeşe berdewam dike. Ger partî û tevgerên karkeran di vê dema nû de li ser pirsên girîng ji Femînîstan re, ji dorhêlcîyan re û ji livbazîyên aşîtiyê re hîtab nekin, dê hêj jî çîna karker kirde

## **Post - Modernîzm**

obja şoreşê ya dîrokî bê dîtin. Di hêla siyâsî de, çêbûna partîyen Kesk û Ekolojîk teorîya Sosyalîzmê ya piştê sanayîyê gesandanê bilezkirin.

Bi her awayî xebatên Îllîch, Marcus, Shumacher û yên din bi Femînîzmê, bi teorîyen alternatif yên çekirinê, bi teorîyen derdorê û parastina derdorê û di bingehê de demokrasî jîn da.»

Boris Frankel – Ûtopyayê(xeyalê) piştê Sanayîyê.

Post-modernîzm di vê pêvajo û rewşê de têt mineqesekirin. Li gor ku min fêm kirîye, postmodernîzm di şûna li dij modernîzmê be —ku tê mana dij modernîzmê— di eslê xwe de li dij Marksîzmê, Sosyalîzmê û hunera rasteqîn ya cîvakî ye.....

— «Modernîte, tiştên ku nûha dibe, yanî zanîstîye. Tiştek çawan dibe Post–Modern?. Ger pirtûka E. L. Doctorov “Salên Zor” postmodern romanek be, Fîlma Tîm Burton “Batman” fîlmek postmodern be, û Xanîyê Koşka Loyd mîmarîya postmodern be, ji hev cûda ev sê tişt çawan bi yek navlêkirinek têñ navkirin û noqtêñ wan yên hevbeş çinin?. Gotina postmodernîzmê îro nav û dengek xirab girtîye.»

Gilbert Adaîr – Postmoderncî du car li derî dixe.

**Derheqê postmodernîzmê de weşanêñ ku bi Tirkî derketine, hatine weşandin evin:**

Serol TEBER – Notêñ Psîqolojî û Sîyasî - Weşanêñ Ara  
Jean - François LYOTARD – Rewşa Postmodernîzmê - Weşanêñ Ara

Rudolf BAHRO – Sosyalîzmek Çawan, Kîjan Kesk, Ji bo çi Sanayî?. Weşanêñ Ayrintî

Jameson, Lyotard, Habermas - Postmodernîzm - Weşanêñ kiyî

Andrê GORZ - Kapîtalîzm, Sosyalîzm, Ekolojî - Weşanêñ Ayrintî

Modernîte û Postmodernîte - Berhevkar : Mehmed Kuçuk - Weşanêñ Vadî

## **Post - Modernîzm**

Nuam CHOMSKÎ - Çavkanîya Medyayê - Weşanên Tum Zamanlar

Nuam CHOMSKÎ - Rastiya Medyayê - Weşanên Tum Zamanlar

John KEANE - Medya û Demokrasî - Weşanên Ayrintî

Evan pirtûkan bi rasterast an bi ne rast û rê qala postmodernîzmê dikan. Di derheqê têkilîyên cîvakî û çandî de agahdarî didin.

Ku mirov di nav pêkanînek de be, an li dij wê be, wek moda cil û lîbasan nabe ku mirov hertiştî bigirê û lixwe ke. Divê mirov baş zanibe ji bo ci û li ko derê ye. Li dij postmodernîzmê derketina me, li gor çîrovekirin û dîtina me ya sîyasî ye, cîhanî ye. Li gor bîr û bawerîya xwe em li dij postmodernîzmê derdikevin.

Divê postmodernîstên me jî şîrove bikin ku ji ko hatine û diçin ko, beylû bikin. Tiştên ku hevdû nagrin, tawirêne hevgirtî û bi berhemên nakokî ji babetan re dibin pêkenîn.

### **KARŞI**

**Edebiyat, Sanat, Düşün Dergisi**

**Sayı : 88**

### **DIJ**

**Kovara Ramanî, Hunerî û Edebî**

**Hejmar : 88**

**Nivîskar :Burhan GUNEL**

**Werger : Lokman POLAT**

# KEÇA ELEWÎ

Herduwa jî bi destê hevdû girtibû û di ber çemê nav bajêr de dimeşîyan. Henîk rê çûn, li ber çem kafetaryayêk hebû, çûn liwê roniştin. Keçikê bi destê kurik hişk girtibû, jidan-dibû. Keçik bi tirs bû. Dilê wê wek xişûşê lêdixistin. Di hundirê wê de hîsêk çêbûbû, dê ew û kurik negihîştana miradê xwe. Wê nedixwestin belêk, tiştêk bê serê kurik. Wê ji kurik pîrr hez dikirin. Lê kurik, qarekterekê xwe yê zeîf hebû. Mirovekî bê guman bû, tiştêk ji xwe re nedikir derd. Dinê xirab bibana xema wî nebû. Ji xwe re digot ez welat-parêz im, şoreşger im, lê welatparêzî û şoreşgerîya wî wek tolazê xançepêkê qirix bû. Keçik bi vê rewşa wî dizanibû, lê dîsa jî jê hez dikirin, dilê wê ketibû pê.

Keçikê ji kurik re got:

—«Malbata min, dê min nedin te. Ji bo vê jî were em dev ji hev berdin, bila ji bo me bûyerek xirab çê nebe.»

Keçik, navê xwe Nermîn bû. Kurd bû, lê bav û dayika wê Elewî bûn. Elewîyan jî, zû bi zû keçen xwe nedidan Kurdên sûnî. Kurik jî navê wî Mizafer bû. Ew jî Kurd bû, lê Elewî nebû. Mizafer û Nermînê hevdû di komelê de dîtibû, û di nav pêvajoya Jîyanê de dilê wan ketibû hevdû, ji hev hez dikirin.

Nermînê wexta ku got: "em dev ji hevdû berdin" Mizafer hêrs bû, xwe aciz kir û got:

—«Çima emê dev ji hevdû berdin?. Qey tu ji min hez nakî?.

## Serpêhatî

Ka evîna me?. Te çi zû jibîr kir. Malbata te çîma te neda min?. Ger te nedin min, ejî dê te birevînim.»

Nermîn:

—«Kiro tu qey min fam nakî. Qey tu nizanî ji bo çi min nadîn te. Em Elewî ne, tu sûnîy, loma dê min nedin te.»

Mizafer :

—«Ez sûnî nînim, tiştêk nînim. Hûn çîra Elewîcîtî dikin. Em sûnîcîtî dikin, ev çîye. Ka tu şoreshger bûn, bavê te jî welat-parêz bûn. Ev elewîcîtî çîye?..»

Nermîn:

—«Elewîcîtî di eslê xwe de pêşverûtiye, lê ez nizanim çîma keçen xwe zû bi zû nadîn sûnîyan. Hemû Elewî bi hevdû re dizewicin. Lê cîsa jî tu were min ji malbata min bixwaze, belkî min bidin te.»

Mizafer :

—«Wella ku wehaye, ez qet nahêm te naxwazim. Ezê te birevînim, qedîya û çû. Ewê ku em ji hev hez dikin, emê bi hevre bizewicin, malbata te nikarê bibe asteng ji me re. Hevalekî min hebû, keçîka Elewî revand û qet tiştêk jî nebû. Hêj jî bi hevre dijîn.»

Di nabeynê de demêk derbas bû. Mizafer neçû Nermînê ji mala bavê wê li gor urf û adetan nexwest. Keçikê îqna kir û bi riza dilê wê, ew revand. Piştê revandinê bavê keçikê Qasim xwe gelek aciz kir. Ji der û dora xwe re got:

—«Kurik çîra nehat wê nexwest, çîra wê revand. Madama ku wan ji hevdû hez dikirin, me dê li gor urf û adetên xwe dîlana wan bikirana û wan bizewicandana.»

Xeber çû ket gohê kurik û keçikê. Ji bo ku bavê keçikê li dij zewaca wan nebûn, wan jî gotin em biçin destê xalê Qasim ramîsin û li hevdû bêñ. Nermîn û Mizafer bi çend hevalên xwe va çûn mala bavê Nermînê. Destê bav û dîya Nermînê ramîsan û roniştin dest bi axitinê kirin. Nermînê ji bavê xwe re got:

—«Me xeta kir, tu me bibexşînî.»

Mizafer mirovekî ters bû. Li ser vê gotina Nermînê hema di cîda gotina xwe got:

—«Na!. Me xeletî nekirîye. Me ji hev hez kirîye û em bi

## Serpêhatî

hevre dijîn. Bavê te nikarê bibe asteng ji me re.»

Qasim aciz bû, got:

—«Kurim, ez ji we re nedibûm asteng. Lî, divê li gor usul û qaîdên adetên me, hûn bizewicîyana.»

Mizafer :

—«Usul û adetên we paşverû ne. Hûn Elewî keçên xwe nadin yên ne Elewî.»

Bi vê tewirî mineqeşe dirêj bû. Wan tiştêk nexistin serê hev. Dawîyê rabûn çûn. Gotinê Mizafer gelek li dilê Qasim ketibû, Qasim bi wan gotinê wî pirr aciz bûbû.

Roja din, Qasim demançê da kurê xwe û jê re got:

—«Ev tiştî hendî bûwe mesela namûsê. Divê tu herdûwan jî li ser hev bukijî.»

Kurik demançê girt û çû li pey xweşka xwe û zavayê xwe gerîya. Di kuçêk de derket pêşberê wan. Newînê gava birayê xwe dît, ji Mizafer re got:

—«Heywax!. Ewê me bukijê....»

Nermînê hêj gotinê xwe neqedand, birayê wê demançê derxist û berê gulê da wan. Nermînê xwe avêt pêşîya mîrê xwe, jê re bû sîper. En pirr gule li Nermînê ket. Nermîn di cîh de mir. Mizafer jî birîndar bûbû. Birayê Nermînê jarjora xwe di wan de vala kir û revîya çû. Mizafer rakirin nexweşxanê.

Mizafer bi gotinê xwe yê ters û ji ehmeqîya xwe bu sedemê vê bûyerê û bu sedemê kuştina Nermînê. Bavê Nermînê jî xeletîyek gelek mezin kir ku, keça xwe bi destê kurê xwe da kuştin. Kurê xwe kir qatîlê xweşka xwe. Kurik jî û ew jî, dê hetanî xweşbin azabê wijdana xwe bikşînin. Traðîsyonêñ weha divê hendî ji nav gelê Kurd rabe. Gelek tiştêkî xetere ku mirov bibe asteng ku keç û kurên Elewî an sûnî bi hevre nezewicin. Divê ev adetên kevnare hendî ji holê rabe.

1994

## Cîhana Nivîskarên Kurd – 1

### M. EMÎN BOZARSLAN Û NIVÎSKARIYÂ WÎ

M. Emîn BOZARSLAN, di 15'ê Ilona 1934'an da li wîleyeta Dîyarbekrê li gundekî qeza Licê hat dinê. Di sala 1960'ı da dest bi nivîskariyê kir û pirtûka xwe ya pêşîn a bi zimanê Tirkî ya bi navê “**İslamiyet Açısından Şeyhlik-Ağalık**” (Ji Alîyê Islamê ve Şêxîtî-Axatî) nivîsî. Ev pirtûk di sala 1964'an da derket. Pirtûka wî ya 2'yan jî bi zimanê Tirkî bû û navê wê “**Doğu'nun Sorunları**” (Şolêن Rojhiyatê) bû. Ev pirtûk jî di sala 1966'an da hat çapkiran. Bozarslan, di vê pirtûka xwe da cara pêşîn, di Kurdistanâ jorîn da jibo zimanê Kurdi azadî xwest û daxwaz kir ku bi zimanê Kurdi bernameyên radyoyê bêñ weşandin, bi zimanê Kurdi rojname û kovar û pirtûk bêñ çapkiran, di dibîstanêngundan da jî bi zimanê Kurdi bê xwendin.

Bozarslan, piştê wan herdu pirtûkên xwe yên Tirkî, dest bi nivîsına Kurdi kir; cara pêşîn “**Alfabê**” ya Kurdi nivîsî û di sala 1968'an da çap kir. Ji alîyekî dî ve jî “**Mem û Zîn**” a Ehmedê Xanîyê nemir hem ji tîpêñ Erebî wergerand tîpêñ Latînî, hem jî ji zimanê Kurdi wergerand zimanê Tirkî û ew jî di sala 1968'an da çap kir. Di wê çapê da Kurdiya “**Mem û Zîn**” ê û wegerana wê ya Tirkî pêkve cî girtin.

## Berhemê Nivîskaran

Pirtûka dîrokê ya girîng û navdar, a ku di sala 1597'an da ji alîyê hukumdar û dîrokzan û nivîskarê Kurd ê navdar Şerefxanê Bedlîsî ve li ser dîroka Kurd û Kurdistanê bi navê "**Şerefname**" hatibû nivîsin, Bozarslan ew wergerand zimanê Tirkî û di buhara sala 1971'ê da çap kir.

Pirtûka Bozarslan a kurteçirokan a bi zimanê Tirkî ya bi navê "**İçerdekliler ve Dışardakiler**" (**Yên li Hundir û Yên li Der**), di sala 1974'an da derket. Di vê pirtûkê de qala rewşa Kurdistana Jorîn a dewra dûzena eskerî ya Tirkîyê ya 1971-1974'an hatîye kirin.

Pirtûka dîrokê ya ku di sedsala XII'an de ji alîyê nivîskar û dîrokzanê Kurd Îbn'ul Ezreq El-Feriqî ve bi zimanê Erebî û bi navê "**Tarîxu Meyyafarqîn we Amed**" (**Dîroka Farqînê û Amedê**) hatîye nivîsin, Bozarslan cîldê wê yê pêşîn wergerand Tirkî û di sala 1975'an da bi navê "**Mervanî Kürdleri Tarihi**" (**Dîroka Merwanîyên Kurd**) çap kir.

Her weha, pirtûka nivîskar û dîplomatê Emerîkî William Aegleton a li ser komara Kurd a Mehabadê jî wergerand Tirkî. Ev pirtûk jî di sala 1976'an da bi navê "**Mehabad Kürd Cumhuriyeti**" (**Komara Kurd a Mehabadê**) derket.

Di sala 1977'an da pirtûka Bozarslan a bi navê "**Anarşîstler**" (**Anarşîstan**) hat weşandin. Ev pirtûk bi zimanê Tirkî ye û çîrokeka pêkenok e ku li ser dûzena eskerî ya Tirkîyê ya 1971-1974'an hatîye nivîsin.

Ferhenga Kurdî-Erebî ya ku Yusuf Zîyaeddîn Paşa nivîsibû û di sala 1894'an da, li ser navê Padîşahê Osmanî Evdilhemîdê II'yan bi navê "**El-Hedîyyet'ul-Hemîdîyye ff'I luxet'îl-Kurdîyye**" (**Dîyarîya Hemîdî di Zimanê Kurdî da**) derxistibû, Bozarslan Kurdîya wê wergerand tîpêñ Latînî, Erebîya wê jî wergerand Tirkî û bi wî awayî ew gêra ferhengeka Kurdî-Tirkî û di sala 1978'an da bi navê "**Kürdçe-Türkçe Sözlük**" (**Ferhenga Kurdî-Tirkî**) ji nû ve çap kir.

## Berhemê Nivîskaran

Pirtûka Bozarslan a Kurteçirokan a bi zimanê Kurdî ya bi navê “**Meyro**” jî, di sibata sala 1979'an da derket. Ev, pirtûka kurteçirokan a Kurdî ya pêşin bû ku li Kurdistanâ Jorîn û li Tirkîyê hat weşandin. Her weha, ev pirtûk, pirtûka M. Emîn Bozarslan a kurteçîrakan a pêşin bû. Ev pirtûk ji 10 kurteçirokan pêkhatîye. Di wan kurteçirokan da, qala jîyana gelê Kurd li Kurdistanâ jorîn di salên 1940'an û 1950'yan da hatîye kirin; di hin kurteçirokan da, qala dijhevî û biyanîtiya navbera gelê Kurd û rejima Tirkîyê jî hatîye kirin û zordestîya karbidestêne wê rejimê li ser gelê Kurd hatîye salixdan.

\* \* \* \*

M. Emîn Bozarslan, ji sala 1979'an vir ve xebata xwe ya nivîskariyê li Swêdê didomîne. Di havîna wê salê da dest bi xebata li ser kovara “**Jîn**” kir. Ev kovar, di salên 1918-1919'an da ji alîyê “Komela Pêşketina Kurdistanê” (Kurdistan Teali Cemiyeti) ve li stanbolê bi Kurdî û Tirkî hatibû weşandin û bi tîpêni Erebî hatibû çapkiran. Kovar, 25 jimare derketibû. Bozarslan, ew her 25 jimare ji tîpêni Erebî wergerandin tîpêni Latînî û ew di pênc cildan da ji nû ve çap kirin. Di her cîldek de pêç jimare cî girtin. Wergeranê jimareyan ên bi tîpêni Latînî û orîjinalên wan ên bi tîpêni Erebî pêkve hatin çapkiran. “**Pêşkeşî**” ya ku Bozarslan bi giştî li ser tevgera rizgarîxwazîya gelê Kurd di navbera salên 1900 - 1920'ı da, bi taybetî jî li ser kovara “**Jîn**” nivîsî, wê jî di despêka cîldê pêşin da cî girt. Ev “**Pêşkêşî**”, ku bi Kurdî hat nivîsîn, ji alîyê Bozarslan ve bi Tirkî jî hat wergerandin û wergerana wê ya Tirkî jî bi navê “Sunuş” li pey Kurdiya wê hat çapkiran. Cîldê pêşin û cîldê 2'yan ên kovara “**Jîn**” di sala 1985'an da, cîldê 3'yan di sala 1986'an da, cîldê 4'an di sala 1987'an da, cîldê 5'an jî di sala 1988'an da derketin.

## Berhemên Nivîskaran

Bozarslan li Swêdê, ji bil xebata li ser kovara “Jîn”, dest bi xebata xwe ya li ser meselok û pêkenok û çîrokên gelî yên Kurdî jî kir; ew meselok û pêkenok û çîrokên gelî yên ku wî di wextê xwe da li Kurdistanê ji nava gel berhev kiribûn, lê belê mecalâ nivîsin û çapkirina wan nedîtibû, li Swêdê dest bi nivîsin û çapkirina wan jî kir. Beşek ji xebata wî ya li ser meselok û pêkenok û çîrokan, rêza “Meselokên Lawiran” bû. Bozarslan di vê rêzê da pênc pirtûk nivîsin. Pirtûka pêşin “Mîr Zoro” di sala 1981’ê da, pirtûka 2’yan “Gurê Bilûrvan” û ya 3’yan “Kêz Xatûn” di sala 1982’yan da, pirtûka 4’an “Serketina Mişkan” di sala 1984’yan da, pirtûka 5’an “Pepûk” jî di sala 1985’an da derketin.

Di sala 1986’yan da, pirtûka Bozarslan a pêkenokên Melayê Meşhûr bi navê “Melayê Meşhûr” derket. Bozarslan ji bo vê pirtûkê “Pêşkêşî”yek jî nivîsi û tê da cîyê pêkenokên Melayê Meşhûr di folklora Kurdî û folklorêngelên cîran de da zanîn.

Bozarslan piştê van pirtûkên xwe yên jorîn, dest bi nivîsin û çapkirina rêza “Pêkenokên Gelî” kir. Pirtûka pêşin a vê rêzê “Masîyên Bejî” di sala 1987’yan da derket. Bozarslan di destpêka vê pirtûkê da “Pêşkêşî”yek jî li ser pêkenokên gelî yên Kurdî nivîsi û di wê “Pêşkêşî”yê da pêkenokên gelî ji alîyêne cure-cure ve jêkve kirin, girîngîya wan di jîyana gelê Kurd da û cîyê wan di folklora Kurdî da îzah kir. Di rêza “Pêkenokên Gelî” da pirtûka wî ya 2’yan jî “Ji Dînan Dîntir” e; ew jî di sala 1988’yan da derket. Pirtûka wî ya 3’yan jî di rêza “Pêkenokên Gelî” da “Îlmê Tûrik” e, ku di sala 1989’yan da hat weşandin. Di vê rêzê da pirtûka 4’an jî “Buka Gulsûn” e; ew jî di sala 1990’ı da hat çapkirin. Pirtûka 5’an jî di rêza “Pêkenokên Gelî” da “Mela Kuli” ye, ku di sala 1991’ê da derket; ev pirtûk, di vê rêzê da pirtûka paşîn e; bi derketina wê, rêza “Pêkenokên Gelî” temam bû.

## Berhemê Nivîskaran

Beşek ji xebata Bozarslan a li Swêdê jî, xebata li ser rojnama “**Kurdistan**” bû. Ev rojname, ku di dîrokê de rojnama Kurdî ya pêşîn e, di sala 1898’an da ji aliyê Mîqdad Mîdhed Bedirxan ve li misrê hatîye derxistin; paşê jî birayê wî Evdirehman Bedirxan kargêriya rojnamê girtîye destê xwe û heta sala 1902’yan weşandina wê li Ewropayê domandîye. Bozarslan, her 26 jimareyên vê rojnamê yên heyî yên ku gihane dewra me, ji tîpêni Erebî wergerandin tîpêni Latînî û li ser wan gelek jêrenot nivîsin û bi wî awayî rojnama ji nû ve ji çapê ra amade kir. Her weha, jibo nasandina wê, jê ra “**Pêşkêşî**” yeka Kurdî ya dirêj nivîsi, ew “**Pêşkêşî**” bi navê “**Sunuş**” wergerand Tirkî jî. Rojnama “**Kurdistan**” di payiza sala 1991’ê da, di du cîldan da derket. Rûpelên wê yên orîjînal ên bi tîpêni Erebî jî digel wergeranen wê yên tîpêni Latînî hatin çapkiran.

M. Emîn Bozarslan, digel xebata xwe ya li ser kovara “**Jîn**” û rojnama “**Kurdistan**” û meselokên lawiran û pêkenokên gelî, ji aliyekî dî ve jî li ser pirtûka xwe ya kurteçîrokan a 2’yan a bi navê “**Şerefa Ristem Keya**” dixebitî. Ev pirtûk jî wek “**Meyro**” ji 10 kurteçîrokan pêkhatîye. Di wan kurteçîrokan da, jîyana gelê Kurd li Kurdistan a jorîn di salêni 1940’an û 1950’yan da hatîye salixdan; her weha, qala bîyanîtî û dijheviya navbera gelê Kurd û rejima Tirkîyê hatîye kirin. Pirtûka kurteçîrokan “**Şerefa Ristem Keya**”, di payiza sala 1992’yan da derket.

Bozarslan, ji aliyekî dî ve jî li ser pirtûka xwe ya meselokên siyasî yên Kurdî ya bi navê “**Kemal Paşa Weledê Kê ye?**” dixebitî. Ev pirtûk ji 70 meselokên siyasî pêkhatîye. Beşek ji wan meselokên siyasî li ser rewşa gelê Kurd, beşek jî li ser rewşa dewletên ku Kurdistan dagir kirine û li ser serok û kargêren wan dewletan hatine afirandin. Bozarslan, di destpêka pirtûka “**Kemal Paşa Weledê Kê Ye?**” da, li ser meselokên siyasî

## Berhemên Nivîskaran

“Pêşkêşî”yeka dirêj jî nivîsî û tê da ew meselok ji her alî ve jêkve kirin, dan nasandin. Her weha, jibo zelalkirina maneyên hin peyv û peyvikan û jibo nasandina hin bûyer û kesan jî du ferhengok amade kirin; yek ji van ferhengokan ji “Pêşkêşî”yê ra ye, yek jî ji meselokan ra ye. Pirtûka meselokên sîyasî “Kemal Paşa Weledê Kê Ye?”, di buhara sala 1993’yan da derket.

Beşek ji xebata Bozarslan a li Swêdê jî, xebata li ser “Mem û Zîn”ê û di 300 salîya wê da ji nû ve çapkirina wê bû. Wek ku tê zanîn, hozan û birêwerê Kurd ê mezin Ehmedê xanîyê nemir, “Mem û Zîn” di sala 1695’an da nivîsiye û ew wek destanek ji gelê Kurd ra mîras hîştîye. Ev pirtûka gewre bûye Destana Neteweyî ya Kurdi. Bozarslan li ser “Mem û Zîn”ê ji nû ve xebitî û ew hem ji tîpêن Erebî wergerand tîpêن Latînî, hem jî wergerand Kurdiya xwerû û Kurdiya wê ya orîjinal digel Kurdiya wê ya xwerû çap kir. Bi vî awayî, cara pêşîn ji xwendevanên Kurd ra îmkan çêbû ku dastana xwe ya netewî bi Kurdiyeka xwerû bixwînin û naveroka wê fam bikin. Bozarslan, ji bo “Mem û Zîn” ê “Pêşkêşî”yeka dirêj jî nivîsî û tê da hem Ehmedê Xanî, hem jî “Mem û Zîn” ji her alî ve dan naskirin. Her weha, li ser “Mem û Zîn”ê ji 1000’î zêde jêrenot nivîsîn û hin bûyer, hin tarîx, hin nav, hin babet û wd. yên ku di pirtûkê da cî girtine, bi wan jêrenotan zelal kirin û gihadîn ronayîyê. Bozarslan, piştê xebateka weha dirêj û fire “Mem û Zîn” di Adara sala 1995’an da, di 300 salîya wê da ji nû ve çap kir.

**KEDA 30 SALAN  
BERHEMÊN M. EMÎN BOZARSLAN  
BIXWÎNIN**

# HÎMDARÊ EDEBIYATA KURDÎ YA KLASİK

Ehmedê Xanî (1652-1707)

M. YILMAZ

**Ehmedê Xanî** di sala 1652an de li Çolemergê hatiye dinê. Ew kurê Şêxê Îlyasê Rustem Begî ye. Weke tê zanîn, di sala 1695an de Mem û Zînê nivîsîye; wek Ferdewsî welatê xwe bi pênûsa xwe xemiland. Ehmedê Xanî bi rewşa xwe ve, bi baweriya ve, bi berhemên xwe ve behrekî bêbinî û bêserî ye. Nivîskar û lêkolvanên kurdan yên mîna Celadet Bedirxan, Qanatê Kurdo, Kamuran Bedirxan, Aladîn Secadî, M. Emin Bozarslan, û hostayê din, li ser Mem û Zîna E. Xanî nivîsîne. Herwisan jî kurdnasên biyanî yên mîna Orbelî, Oskar Man A. Jaba, Margarîta B. Rudêenko û gelekî edebiyatnasên din jî, li ser **Mem** û **Zînê** nivîsîne..  
Lê nîfşa nûh jî wan nivîsarên kevn dubarkirine û pêşkêşê xwendevanan kirine. Lê ew dubarekirina kevn li dema niha nayê. Çimkî edebiyata îro hem dema borî hem jî pêşerojê, ji nûh ve, ava dike.

Beriya ku em derbasî babetê bibin, em navêñ çend klasîkeran binivîsînin, ew jî ev in:

- a) Edebiyata kurdî ya berê zayînê.  
(Sînlekke U. 1200-1300)

---

## Hîmdarê Edebîyata Kurdî

---

**b) Edebîyata kurdî ya piştî zayînê**  
(Baba T. Ekbatana (900- 1000).

Eliyê Herrî 1400- 1500.  
M. Ahmedê Batê 1400- 1500.  
Melayê Cizirî 1500 (?)  
Feqiyê Teyran 1500-1600.

### Berhemên Ehmedê Xanî:

Mem û Zîn  
Nûbar  
Eqîda Îmamê

Weke tête zanîn, Ehmedê Xanî Mem û Zînê li ser çîroka Memê Alan avakirîye, lê çîrokê ji nû ve nivîsîye, bi ramanê hevdemiyê ve girêdaye û bi motîfêن çandî, neteweyî û rêzanî ve xemilandîye û hêjahiya edebî ya sala 1600î li edebîyata cîhanê zêde kiriye. Lewre jî Ehmedê Xanî hem hîmdarê edebîyata kurdî û hem jî hevalbendê Shakespeare, Cervantes e...

Hin nivîskarêن kurd dinivîsînin, dibêjin: "Mem û Zîn bingeha hemû eposan e". Dilê min jî dixwaze ku Mem û Zîn bingeha hemû eposan be. Ev xwestineke ye, nabe ku em vê xwestinê weke dîtineke zanistî diyar bikin. Ew kesên ku wisan dinivîsînin, ew bi berçavka hespê li Mem û Zînê dixwenin. Divê em wek Ehmedê Xanî tiştên rast û durist binivîsînin, em xwe nexin rewşa nivîskarêن tirk yên ku li dijî rastiyê pênuşen xwe bikartînin.

Di hin berheman de hatîye nivîsandin ku êserên "Trîstan îsoldê , Remeo û Julîa û Auccsîn û Nîcotteyê" li ser temaya Memê Alan hatine avakirin. Herwisan gelekî caran tê diyarkirin ku bingeha Mem û Zînê diçe digihêje sala 1300î. Bi bîrûbaweriya min, ev dîtin ne rast e. Çima ?

Ji ber ku ev berhemên jorîn yên ku min navêن wan got , berî Memê Alanî ( Mem û Zînê) hatine nivîsandin. Lewre ji mirov nikare bibêje, ev êserên jorîn li ser temaya Memê Alanî(Mem û Zîn) avabûne anku kopiya wê ne. Li gorî çavkaniyêن zanistî Aucotte û 'îcolde çîrokeke Fransızî ye ku hê di sala 1200an de hatiye

---

## Hîmdarê Edebiyata Kurdi

---

dîtin. Ev çîroka hanê li ser eşqa du zarokan e, ku ew çawa li hemberî hemû zordariyan dibin yek. Trîstan û Îcolde jî di derûdora sala 1200an de hatiye xuyankirin. Ji ber van sedeman, ev tiştekî nakokî ye ku em bibêjin "Trîstan û Îcolde" li ser temaya Mem û Zînê avabûye.

Nivîskarê kurdan gelekî vêkolinan li ser Mem û Zînê çêkirine, lê bi baweriya min, piraniya lêkolinên wan dûrî zanistiyê ne. Çima ? Ji ber ku van nivîskaran xwestine eposa E. Xanî sereke nîşan bidin û ji eserên navdar yên mîna Remeo û Juliyê, ku ji aliyê Shakespeareyi ve (1593-1611) hatiye nivîsandin, jê bilindtir û naveroktir nîşan bidin. Em bi wermadin û fantaziyan negihêjin tu derekê. Ehmedê Xanî bi Mem û Zîna xwe hêjahiya edebî ya sala 1600î li edebiyata cîhanê zêde kirîye neku ew avakarê edebiyata cîhanê ye. Ji ber hêjahiya sala 1600î, ya bi navê "Mem û Zînê", ew hem berhemekê kurdî û hem jî berhemekê navneteweyî ye. Herçiqas bi qasî berhemên navdar yên mîna Remeo û Julia û Hamletê jî mora xwe li dîroka edebiyata cîhanê nexistibe jî, ew berhemekê hêja ye. Divê em bi vî çavî li berhema navdar ya Ehmedê Xanî binêhîrin. Bi gotinekê din; hindî bes e pêwîst e em dev ji baweriyyen hişk û pûç berdin û giraniya xwe bidin ser zanistiyê mayîn. **Mem û Zîn** destaneke piralî ye. Piralibûna wê jî huner û zanebûna pêñûsê tê. Têda edebiyata devkî û hîwûsiyê kurdî xurt e. Di Mem û Zînê de xeyalperestî, xwenperestî û sêhîrbazî jî heye. Bo nimûne:

Du kevokên mî û diya wan çawa ku çavêن wan li Zînê dikeve, ew bi hev re dişêwurî û di dawiya de têne ser baweriyekekê, ew bawerî jî ev e; ew Zînê makulî Memoyî dibînin û lewre wê dixin nav perên xwe û difirinin, diçin ba Memoyî. Ev mîranîyek mîtolojîk e. Hespê Memoyî, Bozê Rewan wek têyran difire, bilind dibe ber bi esmanî ve difire (?). Ma ev ne bûyerên mîtolojîkî ne, ci ne ?

Ma pêwîst e ku em aliyê neteweyî bigirin û aliyê din berdin ? Gava ku em aliyê epîk û mîtolojîk jê bavêjin, hingê navê Mem û Zînê jî namîne.

Ma ne hîmdarê edebiyata yûnanî, Homerosî herdu berhemên xwe yên bi navêni "îliaden û Odesi" li ser kevneşopiya yûnanî ya devkî û hîwûsiyê avakirine. Anku li ser mîtolojiya Zeûsî. Weke tê zanîn, di mîtolojiya kevnare de bûyerên fantazî yên dûrî aqil hene.

---

## Hîmdarê Edebîyata Kurdî

---

Di Mem û Zînê de jî wisan e. Yanê piraniya çirokên cîhanê li ser fantazî û avakariyan avadibin. Ev fantazî û avakarî ji bo çirokên kurdî jî derbas dibe.

**Sedemê nivîsîna Mem û Zînê gelek in, lê hin ji wan sedeman ev in:**

- a) Parvebûna Kurdistanê.
- b) Tunebûna serokekî kurdan.
- c) Tunebûna dewleta kurdî û desthilatdariya wê.
- ç) Mîtolojiya kurdî - edebiyata devkî.

Li ser naveroka Mem û Zînê dîtinên pircur hatine diyarkirin ku hin ji wan dîtinan derveyî naveroka Mem û Zînê ne. Lewre jî pêwîste ez çend gotinan li ser naveroka Mem û Zînê binivîsînim, ew jî ev in:

- a) Evîndariya agîrçavî.
- b) Natiônalîzm- kurdperestî(kurdperwerî).
- c) Destbirakî û hevaltiya rasteqînî.
- ç) Hêza xêrxwaz û ya xêrnexwaz.
- d) Ol-gazinê dînî.

### Çavkanî:

1. Texten, Brîtt- Marîa Larsson, Komvux.
2. Lîtteratur, Orienterîng for Gymnasîeskolan.
3. Combî Visuel, Nordisk, Famîljebok. presenterar, lîtt.
4. Botan Amedî, Kurtler ve Kurdistan tarîhî.
5. Mem û Zîn, Sara forlag , Stockholm, rûpel 7- 12.

# ÇEND GOTIN LI SER ZIMAN

## Ü

## ZIMANÊ KURDÎ

Sîpan

Ziman weke dara fêkiye. Çawa mirov guhnede darê, û li gora demsalan ci pêwîste ji bo jîyana wê neke, ew dikeve bin barê hişkbûnê, yan ji mirov ji fêkîyê wê bê par dimîne. Ne tenê bê par mayina fêkî yan windakirina belg û şaxan, lê demeke wisa tê, ku êdî dar pelan venake, şax ji roj bi roj ber bi hişkbûnê diçin û hêdî hêdî ev nexweşî û xeterî xwe ber-didin koka wê û berjêr dibin. Ziman ji di vî warîde wisaye.

Ev rewş, êdî terqînê ji dilê mirov tîne û li zengilê mirinê, ji bo jîyana wî jîndarî dixe. Lê hîna dema dawîyê nehaşîye. Mirov li hember vê sekeratê (îskêن mirinê) û mij û morana mirina wîde, nema kare bêje tev tiştên ji bo domandina jiyana wî gereke bêkirin, qediyanê.

Riya xelaskirina (parastina) wî heye! Wek ci? Wek zimanê me! Ne gereke, ku

em gelek dûr herin. Di bîra me tê. Ma gelo di bîra kê nayê, ku zimanê me ji ketibû koka xwe û êdî gur hatibû wî. Belg nemabû. Şax hişkdibûn. Lê, ci mabû? Rehêن, bi dehêن metran, ku xwe berdabû nav axê û ew axa bi xêr û bêr, ku wek mertal ew parast heta roja me hat. Ci mabû? kevna-reşîya wî, ya ku ruhêن wî, ji nav sedsalêن dîrokêve têن.

Lê gereke em jîbîr nekin, ku ew dara ji mirinê hatîye parastin, û iro ji hatîye konaxa hilberiyê bi zehmetî û bi xwîdan gihîştiye vê konaxê. Wek xebatêن di tev waran de tênkirin, çawa gav bi gav bi pêşde diçe heta digîhe qonaxekê, xebata li ser zimanê me ji, bi vî awayî çêbûye.

Gereke ku, em bi dilgermî, sipasî û giramîyêن xwe ji wan kesan re pêşkêşbikin, ku li hember hişkbûna vê darê, bi rêkeyî sekinîn, û ew avdan

## Ziman û Zimanê Kurdî

û carek din bûne sebebê saxkirina vê dara xweş, ya ku em di vê kelej û germêde xwe didin ber sîya wê û xwe diparêzin. Nedûre ku ûro şaxên wê hîn tenik bin, lê ji bo mezînbûna wê keft û leftê têkirin, em bi dilxweşî dibînin, kêfxweşdibin û dilşadibin û pê serbilind dîbin.

Ji bo çi bi wê em dilxweş û serbilind dîbin?

Dema em li dîroka netewêن gelek kevnarêن ku hebûn dinêrin, mirov dikare bêje; derveyî navêن wan pêve tiştekî wan nemaye. Gelek mînakiyan em dikarin li ser netewêن ku ûro bi yekcarî ji holê hatine rakirin bidin. Sedemêن ji holê rakirina wan ji ewe ku di pêvajoya dîrokêde nema karin zimanê xwe bidomînin. Her wek tê zanîn, mirov ji cîvakê re bikare bêje, gereke yekîtiya ziman hebe. Ev ji bûyerek bingeniye. Em dibêن netewê me ji vê qonaxa xeteriyê derbasbûye. Lê tev valîniyêن (wezîfe) me, li hember

zimanê me hîn neqediyane.

Bi kêmasî, tiştên ji tev kesan gereke bê xwestin çîne? Nemaze, kesêن ji xwe re welaşparêz, pêşverû dibêjin û ji bo xelasiyê keft û leftê dikin, ci dikarin bikin? Em dixwazin bidin xwuyakirin, ku xebata di rîya ziman de bêkirin, ne tenê ewe ku mirov nivîskar be û biniyîse. Gelek kar hene, dibe ku ji me ve biçük bêne xwîyakirin, lê em li ser wan bipûnijîn, girîngiya wan di jîyana ziman de baş emê bibînin.

Îro kesekî ku salêن wî 50 - 60 in, em jê dixwazin bîst û sîh salan li paş xwe binêre û hinek li ser bipûnije û birame. sîh, cil sal berê niha, klam û bêriten ku di dawetan de dihatin gotin, ûro hêdî hêdî têne jîbîkirin. Ez bawerim, ew kes dema bi şunde vegere û binêre û vê gotina me di bîr bîne, ji seda sed wê li ser vê gotinê, bi vî awayî birame: "Di bextê min de be ev camêr rast dibêje. Dema ez panzdeh salî bûm, bi kêmasî min deh heta bîst

## Ziman û Zimanê Kurdî

kelamên govendê jîber  
dizanîn, lê îro ez dikim  
nakim şes yan jî pênc ji wan  
nayêñ bîra min."

Belê gelî xwendevanan, ma  
ev tiştekî gelekî giran e, ku  
em nikarin pêkbînin. Yan em  
hînî tiştên giran(!) û mezin(!)  
bûne û bo tiştên hevqas  
"piçûk û sivik" re, saet û  
rojêñ me tejîne, û demêñ me  
yêñ vala tunene(!). Ez nebeh-  
werim!

Jî bo hûn jî nebehwerin, de  
fermo werin, em tev bi hevre,  
hilberînyêñ gelê me, yêñ  
çandî, pêseyî, zargotinî û  
h.w.d. ci hene em mil bidin  
milê hev, ji warê devkîde  
derînin. Ú jî bo em wê dara  
ku me ji germ û kelêjê  
diparêze bikin şax û pel, da  
xemla wê xweştir bibe.

Sîpan

## ÇEND GOTINÊN BALKEŞ JI BO ZIMANZANÊN KURD

Gotina min jî bo zimanzanê  
Kurd e. Çend gotinêñ min jî  
wan kesêñ xwe zimanzan di-  
hesibînin re heye. Bê goman,  
ev kes zanayê zimanê Kurdî  
ne. Lê belê, rovîyek gerhok,  
çêtire ji şerekî razayî.....  
Van xweşmêran heya îro  
çend berhem li ser zimanê  
Kurdî weşandine? Ci kemasî  
ji nava zimanê Kurdî derxistî-  
ne, ci li zimanê Kurdî zêde  
kirine? Yan, zimanê Kurdî û  
gelê Kurd ne hewceyî ku ev  
zimanzan hewl bidin û li ser  
zimanê Kurdî hin karubar  
bikin, berheman li ser bi  
weşînine. Ew zimanê ku hêj  
ferhenga wê bersîva demê  
nedê, tê wê manê ku ziman-  
zan tê de tune ne. Li gorî  
min, zimanzanê ku li ser  
ziman ne xwedî berhem û  
gotar be, ne ziman zan e. Zi-  
manzanê mal û demadorêñ  
xwe ye.

Medenî FERHO

# HUNERMENDÊ AHÊNGBÊJ BEŞAR ZAXOYÎ

**Beşîr BOTANÎ**

## JIYANA WÎ

Kek B. Zaxoyî 1945 li Zaxoyê hate cihanê, di sala wî 1952'an de dest bi xwendinê kir. 1956, dîlê wî kete muzîkê û wî dixwest bibe kemanvan. Piştî hingê hevalekî wî ûdek hebû, navê wî kek Feço bû û kek B. Zaxoyî biraderiya wî kir. Kek Feçoyî nedizanî muzîkê lîbide, wisan kek B. Zaxoyî jî... Kek B. Zaxoyî ûda biraderê xwe sê-çar rojan dihanî nik xwe. Careke din, biraderê wî sê-çar rojan dibir nik xwe û carna ew bê ûd dima. Wisan û bi vî rengî sê- çar heyvan dikêşa... Piştî hingê dayika wî gote wî ku baştir e heger ew ûdek ji xwe re çêbike. Wî tirarek(piyanek), çermek, darek û naylona şokan berhev kir û ûdek dirist kir. Wî pê re lêdida û hezkirina hunerê ta 1961 kêşa.

Kek B. Zaxoyî 1963 dest bi

xwendina ûdê li nik fîrkar (mamoste) Mihemedî kir. Hingê wî gelek guhê xwe dida radyoya kurdî-Bexdad. Li gor dîtina wî ku stranê folklorî yên wê demê xweş û resen bûn. Digel vê jî wî gelek guhê xwe dida stranê nû û bi taybet yên hunermenda hêja Gulbiharê. Kek B. Zaxoyî roj bi roj ew bû jîrtirîn xwendevan li pûlê (dersxanê) û bû ûdvanekî jîhatî. Ew 1968 çû radyoya kurdî-Bexdad. Dengê wî ji aliyê komîteyeke dengî ve hate pejirandin û hingê wî du stran tomar kirin. Ya yekê "Wey delal" û ya din "Min nezanî". Dîsan di wê salê de wî çend stran li TV- Bexdadê tomar kirin û li gelek ahegên hunerî beşdar bû.

1970, gelê kurd li başûrê welêt maflî xwe wergirt. Lî wê derê gelek ahegên muzîkî hatine berhevkirin û kek B. Zaxoyî jî beşdar bû û wî bi hunera xwe ya resen bala hunerhezan kêşa.

## Hunermend B. Zaxoyî

Wî digel gelek hunermend û  
hunerhezêñ navdar têkilî hebû,  
kar kiriye û kar dike. wek Dr.  
Bedirxan Sindî, Gulbihar,  
Cemal , Mihemed Qedrî,  
Se`dula Bamernî, Eyaz Zaxoyî  
û hd.

### HUNERA WÎ

Hunera wî kurdî ye û ji kaniya  
Zaxoka Behdînan e. Ya ku di  
navbera Botan û Behdînan de  
dikeve. Wî ji bandora muzîka  
devera Botan gelek awaz  
peyda kirine û digel vê jî hel-  
bestêñ melayê Cizirî bi  
rengekî zanistî strandine.  
Morka(stîla) wî ya taybet  
heye û ew xwediyyê dengekî  
xweş û coş e. Ew Dikare baş  
û b awayekî zanistî dengê xwe  
bi karbîne. Wî, helbestêñ dew-  
lemed, kûr û rengîn ji xwe re  
hilbijartine. Hema ji ber van  
ûştan (sedeman) hunermend  
B. Zaxoyî cîhekî baş li mey-  
dana hunerî girt û dengê wî li  
çar aliyêñ welêt belav bû.  
Digel vê jî şal û şapikên wî jî  
ciwan bûn.

### Çend nimûne ji stranêñ wî

#### 1- Ey felek

Helbest : Dr. B. Sindî,  
Awaz û deng : B. Zaxoyî

Ey felek bo te dinalim

bo çî nêrgizçirmis ïn  
Ew çîma bextê me ho ye  
em bêdest û bêkes ïn...

#### 2- Ez keç im

Helbes: Dr. B. Sindî  
Awaz : B. Zaxoyî  
Deng' : Gulbihar û B. Zaxoyî

#### Gulbihar :

Ez keç im, keça gundan im  
Kulîka serê lawan im  
Rîhana rez û çeman im  
Lawiko ez bêfvan im

#### B. Zaxoyî :

Bêriyê tu xwînşêrîn î  
Dilreq î û lêvhing`vîn î  
Bişkur be gava mi` dibînî  
Bêriyê ez evîndar im...

3-Ciwana min

Helbest û deng : Se`dula  
Bamernî  
Awaz : B. Zaxoyî

C`wana min tu rewşen î  
d`gel bayê spêdê d`kenî  
d`gel bayê spêdê d`kenî  
d`gel bayê spêdê d`kenî..

**Beşîr Botanî  
Zaxo , Gulana 1994**

# NIVÎSKARÎ Û BERPIRSIYARÎ

## Z. SÊXMÛS

Di jiyana mirovî de, her têkilî li ser bingeha berjewendiyen dihête danîn. Berjewendiyên mirovî dibin sedemên pêwendîyan. Hemû têkilîyên ku di navbera mirovan de çêdibin li ser berjewendiyên curbe- cur çêdibin. Gava ku berjewendiyên mirovî ji hev dûr dikeve hîngê têkilîyên mirovî jî ji hev dûr dixe. Ev têkilî rêzanî be ne rêzanî be nayê guhartin. Tiştê ku dihête guhartin jiyana mirovî bi xwe ye. Dema ku mirov ji cîvatekê sûd wernegire, hîngê mirovî li dijî wê cîvatê dixebite. Carna jî mirov ji xwe re dînyayekê ava dike, ku ew dinya tune ye. Yanî mirov bi nav rewşenbîr û nivîskar e. Lê bi berçavika hespê li dabeşan dinêre.

Mahmut Baksî pirtûkekê bi swêdî li ser kesên ku keçan ji Kurdistanê tênin, dizewicin û paşê wan berdin, nivisîne, ku navê pirtûkê "**Bûka Videoyê**"ye. Ev pirtûk weke seneriyoyekê hatîye amadekirin. Di pirtûkê de behsa nebaşıya kurdan dihête kirin. Ji lew re dê xizmetê bike ji bo dijminên gelê kurd. Gava dijminê kurd dest diavêjin namûsa keçen kurd M. Baksî bêdeng dimîne. Lê ew li kêmasiyên kurdan digere. Xwezî ewqas jî li kêmasiyên dijminî bigerîyana. Ji lew re dibêjim: Alîkî em û alîkî ew; li aliyê me **Şêx Seîd, Seyid Riza, Qadî Mihemed, Bedir-Xan, Cegerxwîn**, ... û li aliyê din Mahmut Baksî, Rêber, İdrîsê Bîtlîsi... Gelekî Kurd hene ku ew di nav çarçewên Ewropayê de dijîn. Li wir ci dibînim, ci dikin, çawa dijîn, dibêjin qey jiyana gelê kurd jî wisan e. Rast e ewropî di hin waran de pêşketine, welatên xwe xemilandine. Heger rewşenbîrên kurd demokrasiyê, serxwebûnê bixwazin, divê bikevin nav gelê xwe û bibin rêber û pêşîvanên gêl. Rewşenbîrên kurd divê çewtî û nezaniyan rexne bikin û enîyekê şer li hemberî sextekarî û pasverûtiyê li dar bixin û bixwe jî bibin şervanekî ji bo azadkîrina welatê xwe.

Armancê mirovî anku rewşenbîrekî ji bo cîvatekê li ser çend xalên bingehîn ava dibin, ew jî ev in:

1-Demokrasiya piluralîzmê.

2- Azadiya hiş û fikir.

## Nivîskarî û Berpirsîyarî

- 3- Biratî û wekhevî.....
- 4- Berpirsîyarî ( ligorî M. Baksî rewşenbîrekî kurd dikare di dersxanê de mîz bike û paşê bibêje ev " demokrasî" ye)
- 5- Alîkarî-piştgirî ji bo pêşveçûna civatê.
- 6- Alîkarî ji bo gelên cîhanê yên bindest.
- 7- Azadiya çapamenî.

Azadiya rastiyê ew e ku, nivîskar di fikir û bîrên xwe de azad be, di bin hîkariya tu dewletekê de nemîne, hîngê azad e. Mirovekî rewşenbîr, ku bi serê xwe nefikire, bi serê xelqê bifikire, ew kes ne azad e. Yanî nivîskar di bikarhanîna pênuşa xwe de ne azad be, pênuşa xwe ligorî xwestina dilê xwe nikaribe bikarbîne; hîngê ew ne azad û ne jî dikare bibe rewşenbîrekî kurd. Rewşenbîr ne ew e ku tu xwe teslîmî dewleteke ewropî bikî. Mirovê rewşenbîr berê her tişî şeref û namûsa xwe diparêze. Divê rewşenbîrekî kurd xwe erzan û sifîk neke. Çimkî dostêni mirovê bêrûmet û sivik tune ne. Herkes dikare bi mirovê sivik bileyîze û papiza xwe pê bike. Bi gotinekê din herkes dikare wî bikire û bifiroşe. Kevira giran di cîhê xwe de naleqe. Berê li Swêdê kurd gelekî erzan û bêrûmet bûn, kesî silav li kurdan nedikir. Ji ber ku rewşenbîrên kurd ji bo mafêni xwe yên kesaniyê her pisitiyê kirin. Divê rewşenbîrekî kurd ji bo berjewendiyêni dijminî pênuşa xwe bi karnehîne. Rastî ev e ku gelekî kes bi navê rewşenbîrên kurd pênuşen xwe ji bo berjewendiyêni dijminî bikartînin û hemû kesanî û nasnameya xwe ya neteweyî dixin bin lingên xwe û xwe davêje hembêza dijminî. Bi bîrûbaweriya min ev xweşyekê kurdan ya neteweyî ye ku dibe sedêmên ku baweriya mirovî bi şoreşa neteweyî û demokratiyê nehê. Herwisan ev nexweşî gelek caran dihêle ku baweriya mirovî bi heval û doston jî nehê." M. Baksî û yên mîna wî tu qîmetê nadine dostoniyê. Dema ku karê xwe bi kurdan diqedînin, hîngê wê dostoniyê dixin bin piyêni xwe û xwe diavêjin hembêza kesên din. Divê dostonî li ser berjewendiyêni gelemerperî were meşandin û pêşxistin. Mirovekî rewşenbîr tu caran bi netewpîskarî û netewînkariyê xurt û bilind nabe. Ew bi vir û derewan nikare bi neteweyekê bileyîze û pê bikene.

M. Baksî bi vê pirtûka xwe bi hawayekî eşkere dijîtiya gelê Kurd dike. Her nivîskarek berpirsîariya xwe heye. Xwîya ye ku berpirsîariya M. Baksî jî li dijê gelê Kurd provakasyonî ye. M. Baksî helwesta xwe derxist holê. De bila êrişê gelê Kurd bike. Dîrok tu car wî efû nake.

## XWENDEVANÊN DELAL!

We kovara **Helwest** hejmara yekemîn xwend. We baş dît an na, ew li gor dilê herkesî cuda ye. Dibe ku hinek ji we kovarê baş bibînin, biecibînin, henîkên din jî necibînin. Ji bo kovarê helwestê we çi dibe bila bibe, divê hûn ewil destê xwe bidin ser wijdana xwe û vê pirsê ji xwe pirs bikin: "Ji bo mineqeşe û rexnegiriya çandî, edebî hewcedarîya kovarek heye an na?" Heger hûn dibêjin heye û pêwistîya kovarek weha dibînin, divê hûn hendî jivir û pêve kovarê bixwînin, bibin abonê wê.

Nivîskarêñ kedkar, ger hûn dixwazin li ser babetêñ çandî û pirsêñ edebî mineqeşe û gengeşe zêde bibin, hûn jî besdarê mineqeşeyan bibin. Rexneyêñ edebî binivîsînin, zanatîya xwe ji xwe re berşê nedin, xwendevanan jî bikin şîrîkê zanebûnîyêñ xwe. Lêkolîn û rexneyêñ îlmî-zanîstî binivîsînin û ji kovara **Helwestê** re bişeynin.

Kovarêñ Kurdi, kovara **Helwestê** birayê we ye. Divê hûn bi çavê xweş û biratîyê lê binêrin. Hûn jî nûhderketina kovara **Helwestê** di nav rûpelên xwe de bidin danasînê. Rexne û pêşniyazên xwe yên li ser kovara **Helwest** binivîsînin. Kovara **Helwestê** her tim bixwînin, dibe ku di nav rûpelên kovara **Helwest** de ji bo kovara we rexne hebin, divê hûn bixwînin û ji rexneyan hayîdar bibin. Hemû nivîskarêñ kovarêñ Kurdi û tev nivîskarêñ Kurd, hûn jî kovara **Helwestê** bixwînin, dibe ku ji bo berhemêñ we nivîsêñ rexnegiriyê di kovara **Helwestê** de hebe. Ji bo ku hûn kovara **Helwest** bixwînin, divê hûn bibin abone. Em ji yên ku abone nebin re kovarê naşeyinin. Bibin abone!. Hûn nebin abone û paşê ji bo we nivîsek di kovarê de derbikeve vêca hûn bi çiran li pey kovarê biggerin, hûn dê nebînin. Heger bi we re meraq tunebe û hûn ewqas bi xwe emîn in ku hûn ji bo tu tiştek meraq nakin, wê gavê nebin abonê kovara **Helwest**. Îlim-Zanîstî li ser bingeha şûphê û meraqê ava dibe. De hûn zanin, dixwazin bibin abone, dixwazin nebin. Heger hûn nebin abone, û bi nivîsêñ xwe mil nedin kovarê, kovar dê pêste neçe, dewle-mend nebe. Alîkarî bikin ku kovara **Helwest** bijî. Jîyandina kovara **Helwest** ji bo pêşketina çand û edebîyata Kurdi pêngavek e.

Em hejmara yekemîn a kovara **Helwest** ji we re birê dikin, dişeynin. Heger hûn bibin abone em dê hejmarêñ din jî ji we re bişeyinin, heger hûn nebin abone, em ji we re hejmarêñ din naşeyinin. De bimînin di xweşyê de.

**Kovara Helwest**

## **XELATA KURTEÇÎROKA KURDÎ**

Cîrokvanê delal û xûşewîst, kovara çand û edebîyata Kurdî **Helwest**, we dawetê beşdarîya pêşbiriya kurteçîroka Kurdî dike.

Qaîdên vê pêşbaziyê ev in:

- 1— Kurteçîrok nûh be. Di tu weşanek de nehatibe weşandin.
- 2— Dirêjbûna cîrokê ne pêtirê 10 rûpelan be.
- 3— Her cîrokvanek bi cîrokek beşdar dibe.
- 4— Cîrok li ser dîsketa datayê an ku bi dextîloyê nivîsandîbe.

Xelata Yekemîn — Salek abonetîya rojnameya **ROJ**ê.

Xelata Duyemîn — Dîyarîkirina 10 pirtûkên bijarte.

Xelata Sêyemîn — Salek abonetîya kovara **HELWEST**ê, kovara **ŞANO** û **SİNEMA** û kovara **NÜDEM**ê.

Digel sipasîyên kovara **Helwest**ê.

Adres: Lokman POLAT  
Tensta Alle 43 . 2tr.  
16364 SPANGA/SWEDEN

# **PIRTÛKÊN ÇAPBÜYÎ**

**TORINA ŞÊX SEÎD**

**EVÎN Û JÎYAN**

**JIN Û ZÎNDAN**

**XWÎN  
Û  
HÊSTIRÊ ÇAVAN**

\*

**☞ Ji bo zarokan**

**ÇÎVANOKA EVÎNÊ**

**Derket  
Berhemên Lokman Polat  
Bixwînin**

**Weşanêن Çanda Nûjen  
( Modern Kultur Förlaget )**

\* \* \* \*

# **REWŞA EDEBÎYATA KURDÎ**

**Bi nivîskarêñ Kurd re  
HEVPEYVÎN**

**Amadekar  
Lokman POLAT**

---

---

**CÎHANA ÇANDÎ Û EDEBÎ**  
( Danasîna bi sedan pirtûkêñ Kurdî )

**MÊRXAS**  
Serpêhatiyêñ Kurdî

---

---

**HAWAR Û GAZÎN**  
( Beße Şerê Birakûjiyê )

Pirtûkêñ Lokman POLAT

**DERDIKEVE**

**Weşanên Çanda Nûjen**





**HELWEST**  
**Kovara Çand û Edebiyata Kurdi**  
**Hejmar / No: 1 — Sal / Year: 1995**



Lokman POLAT  
**EVÎNDAR**  
Derdikeve  
Weşanêن Çanda Nûjen



**Helwest** = ISSN - 1400 - 9404